

# DEUGIR

HEJMAR 3, 1996, HER SÊ MEHAN CAREKÊ DERDİKEVE

## Gilles Deleuze

xwekuştina  
feylesofê  
vê serdemê





# DUGIR

HEJMAR 5, 1996, HER SÈ MEHAN CAREKÈ DERDIKEVE

KOVARA KURDÎ LI DERVEYÎ WELËT  
EV KOVAR LI GOR ALFABE, VEKİT Û RÊZIMANA  
MÎR CELADET BEDIRXANÎ DERDIKEVE

XWEDÎ  
Kawa förlag

Berpirsyarê giştî  
Dr. Saïd Mele

Birêvebirêñ kovarê  
Ehmedê Huseynî  
Zagrosê Haco  
Yehyayê Yûsif

Mîzanpjaj  
Arif Zêrevan

Berpirsyarê hunerî  
S. Rêzani

Abonetiya salane  
150 SKR

Adres  
DUGIR  
Box 3437  
165 23 Hässelby  
SWEDEN

Tel/Faks  
46-(0)8-38 39 34

Postgiro  
692357-7

ISSN: 1400-5913

## NAVEROK

- 3      **Pêşgotin**  
5      **Mecazatên Xwedê, Selim Berekat**  
7      **Torebûn Yannis Ritsos; Ez û Şemal Sebnî Botanî**  
8      **»Piştî Nietzsche çawa mirov dikare  
bibe feylesofî«, Ehmed Huseynî**  
10     **»Li Diji-Oedipe« dergehê jiyanekê bê fasizm e,  
Michel Foucault**  
15     **Hemî mirov feylesof int, Michael Hardt**  
19     **Çanda kurdî, rewşenbirê kurd  
û pîrsa nasnameyê, Hendrên**  
22     **Girê Mozan, Marilyn Kelly-Buccellati &  
Georgia Buccellati**  
30     **Ala Midîyan, Dilower Mêgerî**  
31     **Dilbijokiyêke xerab, Zinarê Xamo**  
35     **Peyvîn xewê, Beroj Akreyî**  
37     **Uzunname – III, Rezo Osê**  
58     **Dewleta Dostiki, Fehedê Mustefa**  
61     **Pirtûka kulîkkan, Mihermed Eflî Huseynî**  
65     **Qamişlo, Birahîm Xalid**

Apec-Tryck

# Pêşgotin

**H**ejmara *Dugirê ya siyemîn jî ronahiyê dibîne.* Hejmara siyemîn, di himbêza sersaleke nû de, sersalek ji sersalên kurdên mişext û penaber, li ber zixt û qolincên bêrîkirina bêkutayî bo cîgeh û şûnewar û bargehên zaroktû û ciwanî û hemî bîranînên ku anîha di qermîçekên mîjî û dil de dest bi hilatina xwe yî bêcir dikin, û li ber dergehêne tirsê, tîrsa ji her tişî, tîrsa ji têkçûna coğrafya xewnê ku, bi têkçûneke dîrokî, careke dî, vî miletî bê hiş û bê bîr bihêle, ronahiyê dibîne.

Ji bo çi *Dugir*, ji bo çi kovareke xwerû bi kurdî, ji bo çi wêje, ji bo çi çand, ji bo çi huner, ji bo çi peyv û ji bo çi bikaranîna zimanekî bedew, spehî, resen, hevgirtî, û li beramberî herifandina hest û giyanê zimanê me yê şerîn; ji bo çi hewldana vejandina çavkaniyan û çesipandina nasnameya dîrokî ya zimanê *Mem û Zînê*.

**Z**imanê ku ji me tê xwestin, zimanekî sade, hêsan, eßkere û trojane ye, ne em zimanekî wisa dipejîrinin û ne jî em xwe bi berpirsiyariya dîrokî ya dûbarekîrin û kûrkirina zimanê devikî di qada nivîsandinê de, gunehbar dikin. Bi kurtî, zimanê ku ji me tê xwestin dê neyê nivîsandin, û dê kes ji zimanê me jî tênegihêje. Pira di navbera me û xwendevanan de pira tênegihiştinê ye. Ev tênegihiştin nîşana herî balkêş a berfirehiya bitîna zimanê me ye û kûrahiya bandora zimanên dagîrkeran e.

Di nava vê çendîn û xirecira rojnamegeriya kurdî de, ya ku ji alî komaleyän û partîyan û kesan ve derdiçe, mebest ji hejmareke siyemîn çi ye?

Ji hejmara pêşîn ve, *Dugirê* dixwest rêça xwe ya cihêreg û taybetmend biafirîne. Pirsan pêşkêş bike û guh nede bersivan.

Dîsa jî, di amadekirina vê hejmarê de, projeya hewldana dameziranîna çandeke pirsamêz, hem wek hişyariyeke rewşenbirî û hem jî wek dahênanîneke zimanî, ji bîra me neçûye.

**D**ugir xweş dizane ku ev serdem, di warê afirandin û dahênanîna peyva kurdî de, serdema têkçûn û tevlihevî û sextekarî û hilperikîn û xwepêşandana erzan e. lewra *Dugir* di awirvedana xwe de, di pêkanîn û bidestxistina bahaneyêñ hebûn û jiyana xwe de, reş-

bîn e. Di vê reşbîniyê de, bi hişmendî û bi cegerdarî dixebite da ku hêjâyî afirandina pirsan bit. Da ku bi cegerdariyeke rewşenbîrane li beramberî bersivên bê guman û yekalî û reha, raweste.

*Dugir* hewl dide.

*Dugir* ji bo sazkirin û peydakirina felsefeya pirsê dê hewl bide.

Hetanî anîha bertekî (reakisyon) û helwestên rewşenbîr û xwendevanan em hogirî hêza berdewamkirina *Dugirê* kirine.

Serê me bi nameyên pesindanê mezin nebû û tu carî jî dê mezin nebe. Herwiha em ji bertekiya nivîskarên ne-nivîskar ên ku tenê di rewşa zimanekî wek zimanê kurdî de dikarin nêçîrê di ava şêlû de bîkin, ku *Dugirê* bi çavêن gumanê li rola wan temaşe dikir û dike, netirsiyan.

*Dugir* ci ye?

Pencereyeke dilovan û şîn e, pencereyek e bi ser wêjeya kurdî de, ji bo dahênan û huner û peyva resen hatiye vekirin. Bi kurterûpelên xwe, bi abonetiya xwendevanan, dikare bibêje ku di meydana hişmendiya pirsyarê de, dest bi vekirina rêça xwe dike. Di vê xebatê de gelek xwendevanên zana û bîrtûj ji xwe re peyda kirine, û hê jî hewl dide ku xwendevanên sade yên ku hînî peyvîn amadekirî û têrmîn vala bûne, rizgar bike, wan biguhêzîne cîhana peyvê ya rastîn.

Ji destpêkê ve em dizanin ku em dê nikaribin bi darê Mûsayî deryayê biqelêsin û werîsan bikin mar, lê em dê her û her bipirsin:

Afirandin û dahênan kurdî ci ye?

Ev dahênan li kû ye?

Nivîskarî ci ye û kî nivîskar e?

Pirs li kû ye ? 

DUGIR



## Mecazatên Xwedê

**W**ek mirovine ku di tirajîdya gerdûnê de bê temen bin, renckêşana yekemîn a şkestinê xortaniya me da ku em bi cîhanê mijûl nebin em hogîrî stiranê dikirin. Stiran wek formeke ji formên mirina lîş: Tenê deng, guncîna nemir e, madam borîzana xwedayî dê Qiyametê bike dergehek bo deqê dilovaniyê di pêşbirka giyan û behîstê de, bi hev re ber bi kamilbûnên xwe ve. Em, ên ku bi xeyalan hatibûn agahdarkirin, xeyalênu ku bi hişkî navra na realîteya jihevketî zeftkiribûn, renckêşana yekemîn em hînî xwe-veşrtina di stiranan de kiribûn; xweveşrtina di xelatênu wan ên biçûk de û di nenasîyên wan de yên ji çolistana vekirî dilovantir. Tî carî jî pêwist nedikir ku em peyvîn wan stiranan, têbigihêjin.

Me Nêrgiz, Dîlib Komar, Mahîbal, Sîrabano, Sonal Dît, malbata Kabûr, malbata Rackomar û Dîvanand nas kirin.

Artîstine di çesnê êşa ku nayê şrovekirin de bûn. Mîna temenêne me yên sade ew jî sade bûn, Hemîyan bi dengê xwe yan jî bi dengê hineke dîtir distira; çînkî, berzexâ di navbera giyanêne me û dîmenê de deng bû. Em digiriyan. Şevistana di hêwanêne tarî yên sînemayê de; wê demê, gavêne qederê ber bi dîmenê ve bûn: Rastiyê li ber destê bê-hûdeyîya xwe gilî dikir.

Ew êşa ku bi kûrekûr li dorhêla temenêne me digiriya; wê demê, serçavka artîstî, di berztirîn kîlîka sernîştvbûna wî ya ber bi pêkenîna dijwar de ku girî û kûrekûra şanoyê çepiklêdana ezeli dagîr dikirin, li xwe dikir.

Her bizaveke ji bizavêne artîstî em bi girî vedikirin, her reqsekê em bi girî vedikirin, her serkeftinekê, her têkçûnekê û her xweşikbûnekê em bi girî vedikirin. Wisa, rûniştekên hêwanêne Sînemayêne bajarêne me yên ku ji serpêhatiyêne xwe ber bi serpêhatiyêne Hidî ve direviyan,

diêşandin.


Artîstine ji Hindê, û stiranîne Hindî, zimanekî ku em tênedigîhiştin, lê bi sihra xwe yî nehêni û veşartî şarezayîyeke tund û hevgirtî bû. Digel ku Selman Ruşdî navê Şamî Kabûr hilnagire jî, lê neviyê wê şarezayê ye, şarezayiya ku temenên me bi girî vekiribû, ne ku bi giraniya xwe, lê bi wê renckêşana ku mîna derbendê berhev dibû, renckêşana ku ji gemkirin û bindestiya bê ser û ber dihat, li vir, malbat û dibistan û Xwedê bi hev re dixebeitîn da ku gemkirinê dijwartir bikin. Jixwe yên ku bi çarenûsan dilîstin her û her Xwedê palpişa wan bû.

Ez bi xwe di xwendina xeybê de ne hosta me, lê di amadekiranâ vebêjiyê de xwe dispêrim dadperweriya giyanan, da ku dem li ser bingehêni ji axê xwendan amadeyiyeke rewanbêjane be. Ku ne li ber destê Xwedê bit bila tu kes gili neke.

Ji ber ku Xwedê jî di destnîşankirinê de berfireh e, radek e ji radeyên ne sînorkirî, pileyên gelemer î nenas qirêj dike ku ev jî nexuyayıya sihrî ya hebûna wî ye, û di nexuyayıya sihrî ya hebûna Xwedê de, di pêvajoya "hesabê adil de" hertişt xwedanê hilbijartin û biryara xwe ye.

Lewra çavkaniya mirinê nakeve destê ti kesî, aniha, hemî bend û name hatin agahdarkirin, Islam wisa dibêje.

Ji xwe çarenûs jî "imtihanên xeybê ne"; xeyba ku bi navê Selman Ruşdî maf nedaye ti kesî. □



Selman Ruşdî

## Torebûn

Di rûyê hetavê de, çavêن xwe girtin,  
Lingê xwe berda nav deryayê.  
Cara yekemîn bû ku derbirîna destêن xwe dibîne,  
Westaneke veşartî, berfireh wek azadiyê.  
Cigir diçin û têن  
Diyariyan û baweriyê hildigirin,  
sozêن nasnav û talanêن bê mînak didin.  
Ew bi xwe bawer nake,  
çavdêriya kevjalê ku bi koteکî  
hildikişiya ser zixurekî dikir,  
hêdî hêdî, bi tîrs, lê bi awakî fermî,  
mîna ku hildiperike ebediyetê  
Wan bi xwe nizanîbûn ku  
torebûna wî tenê behaneyek e.


YANNIS RITSOS



## Ez û Şemal

Hilket li min şemalek  
Can û cerg û dil birin  
Piştî ez û dil malek  
Ez û dil ji hev kirin  
Dil bi şemalê mest bû  
Şemal, bû şewq û şemal  
Badeya eşqê hest bû  
Hest bû zanîn û kemal  
Dil dakete evînê  
Ez bûme maka derda  
Şemal bû gola xwînê  
Dillî girt û neberda

SEBRÎ BOTANÎ



ELSEFE

EHMED HUSEYNÎ

## »Piştî Nietzsche çawa mirov dikare bibe feylesof?«

**S**ergermtirîn feylesofen vê serdemê, ramyar û rewşenbîrê pîralî, rexnegir û lêkolîngerê hemî zanistiyêن mirovî; hemdem û hevalbendê Michel Foucault û Guttari, di roja şemîyê de, 4-ê mijdarê (november) 1995, piştî êşkêşaneke dijwar, li Parîsê, xwe ji pencereya mala xwe davêje erdê, xwe dikuje.

— Renge ev serdema me bibit serdemeye Deleuzeî!, carekê Foucault bi xwe wisa gotibû..

Deleuzeî di her 30 pirtûkên xwe de, hewldaye ku stûnêن ramana felsefi bihejîne, ku zimanekî nû û dannaşneke nû bo felsefeyê biafirîne. Di berhemên xwe de, hişyarî û dahênan û Ipstimolojiya vê sedsalê ya felsefi, psîkoloji, sosyoloji, filoloji, wêjeyî û hunerî, berhev kiriye.

Herwiha di jiyana xwe de, wek çavdêrê bûyerên vê serdemê jî şahi-dekî bêhempa bû. Wek J. P. Sartre û Foucault li dijî destdirêjahiyêن desthilatdariya siyasi û li dijî qirkirina miletên bindest û pelçiqandina azadiya mirovî, bi tundî radiwestiya.

Bê guman bi çûna Deleuze (1925–1995) dê cîhana felsefi ramyar û lêkolîngerekî bêmînak winda bike. Deleuzeî ku di bîr û baweriyêن xwe de û di serencamên lêkolînêن xwe de hewl dida ku têramandinê bi jîyanê ve girêbide, ku sedema hebûnê di hebûnê bi xwe de ronî bike. Bi vî awayî "felsefe ji êrişen kapitalizmê rizgar dikir û çiyetiya mirovên ku li bazarê sergerdan in, diparast" dida xuyanîkirin ku mirovê vê serdemê di bin barê nîrx û sinc û qezenc û renckêşana bazara lîbirînalî de pişt şikest û bê armanc e.

Ansiklopediyêن felsefi dinivîsinin ku xebat û dahênanâ Deleuze di sê qonaxêن bingehîn re derbas dibin:

Qonaxa yekemîn pirtûkên wî yên li ser dîroka felsefeyê ne. Di van

pirtûkan de li ser Hume û F. Nietzsche (1844-1900) û Kant (1724-1804) û Bergson (1859-1941) û Spinoza, bi awakî cihê cihê, li ser bîr û baweriyên wan, berhem û deqên wan yên giring, dînîvîsîne, bi şeweyekî cihêreng cîhana wan a ramanî û felsefi ron dike. Deleuze bi xwe li ser van pirtûkan dibêje ku "ev pirtûk tabloyên ramanî ne, tiştên ku feylesof bi xwe gotibû dûbare nakim, lê tiştên veştarî yên ku negotibû û di gotinan de amade ne, şirove û zelal dikim".

Qonaxa diwemîn qonaxa aferandina hevbeş a li gel zanyarê psîkolojî Félix Gottsche ye. Ev qonax di sala 1972an bi pirtûka *Li dîjî-Oedipe* dest pê dike û bi pirsa "felsefe çî ye" di sala 1991ê de bi dawî tê. Ev hevkarî û hevbeşiya nivîsandina pirtûkan; di warê felsefê de; wek bûyer û diyardeyeke seyr û ekzotîk dihat dîtin, Deleuze'yi digot:

"Em ne wek du kesan bi hev re xebitîn lê wek du rûbaran."

Wisa li rada salên dirêj herdû feylesofan bi hev re li ser felsefê, siyasetê, dewletê, desthilatê, zanistê, wêje û hunerê dînîvîsandin.

Di qonaxa sêyemîn de, Deleuze wek dahênerê bîrûbawerîyan, gernameya xwe ya felsefi berdewam dike. Dide xuyanîkirin ku erka bin-gehîn a felsefê û bahanêن hebûna wê, afirandina bîr û bawerîyan e: "Felsefe ne peywendî û têramandin e, dahênan e, û di xurista xwe de şoreşgêrane ye. Mercê bingehîn ê felsefeyê ew e ku xwedî pêwîstî û seyrbûn be, madam bersiva pirsine rastîn dide gerek bikaribe wê pêwîstî û seyrbûnê bi dest xîne."

Di ramana xwe de Deleuze li beramberî dabeşkirinên dibistanî radiwestiya. Berhemên xwe bi navê yekîtiya ku piraliyê bi kar tîne, dida nasîn. Hergav vê pirsa bingehîn naveroka wan bi hevdû ve girêdide: "Çawan piştî Nietzsche tu dikarî bibî feylesof?"

Di warê wêjeyî (edebî) de, Doloz, dûr û dirêj li ser rol û erk û çiyetî û çawayiya nivîsandin û aferandinê, radiweste.

Li got bawerîya wî, gerek wêje di hundirê zimên de zimanekî dî bisfirîne. Zimanekî ku di çesnê sergêjahiya sihrî de be da ku bikaribe ziman bi xwe ji zuhabûn û ji çarçewên hişk rizgar bike. Nivîsandin ne ew e ku tenê mirovbihêle peyv û wişê bistirên, gerek mirov hewl bide ku ziman biherifîne, bihejîne, bilukumîne.

Gerek nivîsandin terazûn û qanûnên zimên bişikîne, wan bigindirîne da ku bibin sermestiyeke sihrî û xweşik. □



## »Li Dijî-Oedipe« **dergehê jiyanêkê bê faşîzm e**

Lî Ewrupayê, di salên 1945–1965-an de, rêçekerê tendûristane bo tê-ramandinê (têfikirinê), şeweyekî destnîşankirî bo gotara(xîtaba) siyasi, û sincine (exlaqine) destnîşankirî bo yê rewşenbîr, hatibûn peydakirin. Bivê nevê, gerek mirov peywendiyeke gur û germ ligel Marks girêbida, û gerek nehiştâ ku ramanên wî mişext bibin û ji Sigmund Freud bi dûr bikevin, gerek rêxistinê rêber bi rêzgirtineke pir bilind çareser bikira. Ev hersê merc di warê mijûlbûna mirovan de; mijûlbûna bi nivîsandinê û mijûlbûna bi gotina beşekî ji rastiyê, ci li ser xwe û ci li ser serdema xwe be, dihatin pejirandin.

Pişt re pênc salên bi lez, xwîn germ, pênc salên ji kêfxwesi û mami-kan, bi ser Ewrupayê de hatin. Li ber dergehênen vê cîhana me, bê gu-man, Vietnam wek yekemîn kulma ku li bin guhê desthilatdariya damezirênkár diket, radiwestiya. Lê li vir, di nav paşila me de û li ber çavên me, ci çêdibû? Tevlîheviyek ji siyaseta şoreşgêri ya li dijî gemki-rinê? Ceng ji li ser du eniyan dadayıye: Xwînmijiya komelayane û gemkirina psîkolojane? Hilperikîn û bi hêrs hilkişîna Libidoyê ya ku ji alî pevçûna di nabera çînan de hatibû dirustkirin û amadekirin? Renge wisa be.

Ku çawan be ji, ev şirovekirina naskirî û dualî bûbû bahaneyâ ku bi alîkariya wê; bûyerên wan salan ronî dibûn.

Xewna ku di navbera şerê cîhanê yê yekemîn û derçûna faşîzmê de; bi çelengîya xwe qatêن utopîk li Ewrupayê – li Elmanyaya Vilhelm Rayş û li Fransaya surealistan – sermest kiribû, ew xewn vegeriya da ku ji nû ve pizota wê rastiyê bi xwe, gur bike: Marks û Freud bi heman gurbûnê hatibûn ronîkirin.

Lê, ma bi rastî tişa ku çê bûbû ev bû? Ma bi rastî ji pirs bi vejandi-na projeya otobî ya salên sihî ve, û vê carê di sewiyeta bikaranîna dî-

rokî de, girêdayîbû? Yan jî bizavekê, berê xwe da berevajiya vê rewşê, berê xwe da nakokî û pevcûnên siyasi yên ku qet nema li gel nimûnederiya (nimûzeca) ku rewişa Makisî bîryar li ser dabû, digunciyan? Yan jî berê xwe dan alî ezmûneya xwezayê (tecrûbeya rexbetê) û teknîkên wê yên ku nema bi Froyid ve girêdayîbûn? Bê guman çend alên kevnar bilind bûbûn, lêbelê şer ji meydana xwe hat guheztin û di çend herêmên nû de bi cih bû.

"Li Dijî-Oedipe" yekemîn tiştî û berya her tiştî berfirehiya meydana nixumandî, eşkere dike. Lê ji vêya bêtir û ji vêya gelektir, pêk tîne. Rûreşkirin û devavêtina pûtêن pîrbûyî, tinazî û lîska bi Freud re jî, vê berhemê tar û mar nakin û giranbuhayıya wê jî qels nakin. Di bingeha xwe de, nav di me dide, me dehf dide ku em berê xwe bidin kûrâhiyên dûr, ên pir dûr.

Xwendina pirtûka "Li Dijî-Oedipe" mîna çavkaniyeke teorî yî nû be, çewtiye - ji xwe hûn wê teoriya bi navûdeng a ku hergav li ser dîpeyivin û wê radîghînin me, dinasin: teoriya pir alî ya ku dê bi awakî reha, gelempêr û sozdar be û dê bersiva her tiştî bide, dibêjin ku "tu yê pir hewcedarî vê teoriyê be" bi taybetî di vê serdema ji hevketî de, serdema pisporiyê, serdema ku bê hêvî maye.

Gerek di nav vê xirecira tırsnak a ramanen nû û bîr û baweriyên têkperane (mifaci') de: Gerek em li felsefeyê negerin, çinkî "Li Dijî-Oedipe" ne peykerekî cirusonkî ye. Di bawerîya min de çêtirîn xwendin bo "Li Dijî-Oedipe" ew e ku mirov bixwîne û wek "hunerekê" li hember raweste, mebesta min bi hunerê ew hunera -wek nimûneku di çesnê "hunera erotîk" de ye, çunkî analîzkirina peywendiya arezûyê bi realîte re û bi "alava" kapîtalîzmê re, bersiva pirsên berhest (mehsûs)pêşkêş dike, pirsên ku guh didin çawatiya tiştan bêtir ku guh bidin jîboçiyetiya wan. çawan arezû di gotarê (xîtabê) û di kirinê de, li tevlî ramanê (fikrê) dibe? çawan arezû dikare, bivê nevê, di hundirê çarçewa siyasetê de xebatê bike, û di hundirê berdewamiya guhertina sistêma heyî "hunera erotîkî - hunera teoriyê - hunera siyasetê" de, çawan dikare bi hêztir bibe?

Li vir, hersê dijminen ku pirtûka "Li Dijî-Oedipe" dixwaze li hemberî wan raweste, derdiçin.

Sê dijminen ku di hêzdariya xwe de ne wek hev in, û di tirsonakiya (xetera) xwe de ji hevûdû cihê ne, pirtûk jî bi alavine cihêreg şerê wan dike.

I - Sofiyên siyasi, şoreşgêrên bêzar, terorîstên teoriyê, û ew kesen ku

dixwazin sistêma zelal a siyasetê û gotara siyasi biparêzin, û bîrokratîyen şoreşê û karmendêna rastiyê.

2 – Teknikzanê arezûya belengaz – psiko-loji û sîmyotîkzan – ên ku dixwazin hemî rûdan û nîşnanan binivîsinin û dixwazin sistêma arezûyê ya piralî di qanûna strûktûrê de û di psporiya dualî de, kurt bikin, biqurmiçtinin.

3 – Dawî jî dijminê stratejî ye. Dijminê herî mezin e, ango faşizim e. Ne hema tenê faşizima dîrokî ye: Faşizima Hitler û Mosolinî ye – ya ku xweşik dizanîbû dê çawan arezûya xelk û cemawerên xwe qezenc bike – Lê belê faşizma ku di hundirê me de, ku di hundirê me tevan de bi cih bûye, û desthilatdariya xwe li ser aqil û dan û stendina me ya rojane dike. Faşizma ku ji bo bi destxistina desthilatê, me sermest dike.

Pirtûka "Li Dijî-Oedipe" pirtûka zanistiya exlaqî ye – bila herdû nîviskarên wê li min negirin – Yekemîn pirtûk e ku li Fransayê di vî warî de hatiye nivîsandin û ji mêt ve me tiştekî wilo nedîtiye." renge ji bo vê yekê jî, serkeftina wê di nav xwendevanên taybetmend de, bi sînor nebû: Eger mirov li dijî Oedipe be, awayek ji awayên jiyanê ye, rengek ji rengên téramandin û jiyanê ye".

Gerek em çawan bixebeitin da ku em nebin faşist, bi taybetî hetanî wexta ku em ji xwe bawer dikin ku, em xebatkarine şoresgêr in? çawan em dikarin aqil û hişê xwe, kirinên xwe, dilên xwe, û xweşiyênen xwe ji faşizmê rizgar bikin?

Nivîskarên sincî (exlaqî) yên fileh di nav qermîçekên giyan de li şopa lêş digeriyan. Lê Deleuze û Gottari pirê caran kêmîtirîn şopêna fa-



Michel Foucault

şîzmê di lêş de destnişan dikin.

Em dikarin bibêjin "piştî ku em silavêن xwe, silavêن pîrozbahiyeke biçûk, pêşkêşî San Franswa Dosal bikin" ku pirtûka li dijî Oedipe dergehê jiyanekê bê faşizm e.

Ev huner: Hunera jiyana berevajî hemî formên faşizmê, faşizma bi cî bûyî û ya ku xwe amade dike da ku bi cî bibe, li gel çend prensîbên bingehîn ên ku ez dê li jêr wan eşkere bikim, vê pirtûka giranbuha û bê mînak; dikin rêber û alava jiyana rojane:

— Xebata siyasi ji hemî formên yekalî û piralî yên paranoyayê rizgar bikin.

— Kirinê, ramanê, arezûyan bi, ji dayikbûyînê, û bi linikhevdanînê, û bi jihevcihêkirinê, bi hêztir bikin.

— Ji têrmên kevnar ên dîlîtiyê, yên négetîv – qanûn, sînor, xesandin, psporî û valahî– yên ku her û her di ramana rojava de, wek formên desthilatê û wek şeweyên têglihiştina realité; bi pîrozmandî dihatin parastin, rizgar bibin. Pirhejmariyê û nakokiyê û pozitîviyê biparêzin, li dijî wekhevî û yekfikirinê bi tundî rawestin.

— Bila tu carî neyê bîra we ku mirov, tişta ku ji bo wê şer dike çiqaşî békér û kirêt be jî, gerek bêzar be ta ku bibe şoreşgêr. Peywendiya arezûyê bi realité re bi xwe xwedî hêzeke şoreşgêriyane ye; "ne ku rev û bazdana ber bi wekhevbûyînê de".

— Tucarî ramanê nexebitînin da ku hûn nîrxê rastiyê bidin xebat û karêن xwe yên siyasi. Herwiha çalakiya siyasi bi kar neynin da ku hûn ramanekê ji ramanan qels û lawaz bikin mîna ku bazar û bazirganî be. Xebata siyasi ji bo çesipandin û rehdaçikandin û kûrkirina ramanê bi kar bînin.

— Tucarî avakirina "mafî" takekesan (ferdan) wek ku felsefeyê destnişankiriye ji siyasetê nexwazin. Takekes berhemê desthilatdariyê ye. Pêdivî (wacîb) jî "tunekirina forma takekesî ye". Gerek ne hema tenê komle peywendiya jîndar a yekbûna takekesan be, lê belê gerek bibe xebatkara herdemîn a tunekirina forma takekesî.


— Bi evîna deshilatdariyê serimest nebin.

Em dikarin ji wilo dûrtir herin û bibêjin ku Deleuze û Gottari pir kêm ji desthilatdariyê hez dikin, hewl dane ku kirinê desthilatdariyê yên ku bi gotara wan î taybetmend ve girêdayîye, bê alîgirî nîşan bidin. Piş re rola lîsk û xapandinê berfireh ên ku di hemî rûpelên pirtûkê de bi cî bûne, têt. Lewra wergerandina pirtûkê ezmûneyeke (tec-rûbeyeke) aloz e, pêdivîyî hêzdariyê ye. Lê pirs ne hema bi wan xefk û

dafêñ vedayî ve girêdayîye: Xefkêñ rewanbêjiyê (belaxetê), û xapandînêñ ku cilê ji bin lingê xwendevanan dikişînin da ku xwendevan agahdarî lîskan nebin. Da ku di dawî de wan wek piştgir û alîgirêñ doza dahêneran, qezenc bikin:

Xapandinêñ pirtûka "Li Dijî-Oedipe" xapandinêñ tinaziyê ne: Bangêñ radestbûn û qewirandinê çiqasî pir in, bangêñ ji dest avêtina pirtûkê piştî bi dû xwe de girtin û asêkirina derî çiqasî pir in, gelek caran pirtûk me dehf dide gumana ku tenê ji bo lîsk û pêkenînê ye, hetanî di wan mijarêñ bingehîn de jî wisa dixuye: wek, bi peyketin û qewirandina hemî formên faşizmê, formên hêzdar ên ku me dorpêç dikin û me dipelçiqînin hetanî formên bêkêr ên zordariya tal a jiyanêñ me yên rojane. □

\* Ev deq cara pêşin bi firansî di kovara *Gencîneyêñ wêjeyî* de, di hejmara pêncan a sala 1988an de, hetiye belavkirin. Me jî ji erebî ji kovara nivîsandinêñ nûjen wergerandiye kurdî.



## Hemî mirov feylesof in

**B**erhemên Gilles Deleuze [1925–1995] baya jiyanekê nû di felsefeyê de weşand, lê belê ev bi awayekâ welê çêbû ku dibe ne tam felsefik be. Di hemî kariyerê jiyanâ xwe de wî pirseke bingehîn kir: Mirov çawa jiyanekê bextewar bijî? Çawa em dikarin di cîhanê de kerbêl dilbijîn bigihînin kîrteya herî bilind? Deleuze'yi dîroka felsefeyê (digel dîroka edebiyat, huner û sînemayê) wekî xelîtokekî hacetan bi kar anî, da ew bikare vê problemê fêm bike.

Di qunaxa pêşiyê ya kariyerê jiyanâ xwe ya di salên 50- û destpêka salên 60-yî de Deleuze nependî xebitî. Wî li Sorbonnê dixwend, digel ku piraniya wan feylesofen navdar yên fransî (yek ji wan Althusser, yekî din Foucault û yê din Derrida) li wê unîversîteya têrprestij École Normale Supérieure-yê dixwendin. Deleuze ne endamê partiya komünîst jî bû, herwekî ku piraniya xwendekarên hevdemên wî endam bûn. Bêguman Deleuze di hemîjiyana xwe de beşdarî rêxistinêni cida yên cep bû (raperîna xwendekaran ya gulana 1968-an, otonomîstên italî yên salên 70-yî û rêxistina Filistînê), lê wî xwe ji hemî têkiliyên rêxistinî bi partîyan re vedida. Ew bi dirba xwe ve çû, dirbeke welê ku hem têralî û hem jî yekalî bû.

Di dawiya dawî de gava ku Deleuze navdar bû, wî bi awayekâ pir bi diqet xwe ji pozîsyona rastgoyê civata vekirî veda, [pozîsyoneke] welê ku feylesofen din yên firansî tovê wê avêtibûn. Ew pir nedigeriya, kêm caran hevpeyvîn qebûl dikirin û qebûl nedikir di TV-yê de derbikeve – ne ji ber ku ew pir şermoke bû an jî lê dixebeitî ku kesayetiya xwe di mîsteryoma destnegihanê de veşêre, belkî pirtirîn ji ber ku wî bi çavekî kirêt li wê desthilata ku têt dayîn bo feylesofekî navdar dinêri.

Berhemên Deleuze'yi yên destpêkê (berî 1968) piranî ji monografiyên li ser qehremanên girîng yên dîroka felsefi ya ewropî pêk têr, hînek ji wan Hume, Bergson, Nietzsche, Kant û Spinoza ne. (Paşê wî pirtûkek di heqê Leibnizî de jî li wê rista xwe zêde kir.) Di van pirtûkan de Deleuze'yi tagiriya şagirtekî ku lê dixebite disiplîna felsefeyê fêrbibe kir. Bi keşkeyî û awayekî pedagojîk yê zelal wî ew tiştîn giranbiha yên ku wî li nik her feylesofekî diditîn pêşkêş kir, û wî welê kir ku ramanêñ kevin bibin wekî yên jîndar û hevdem.

Lê belê her di eynî demê de wî avahiyê dîroka xwe ya felsefi jî çêkir. Wî awayê nivîsandina dîroka felsefeyê hişyariyek dida tradisyonâ transsensual [tişta ku li derveyî tixûbêñ têgihiştina hiş û bîran bê] ya felsefi ku hingê di unîversiteyên fransî de serdest bû. Hîletê Deleuze'yi ji diyalektika Hegel û idealizma Platonî dicû. Wî bawer dikir ku hîzirîna transsensual di dawîya dawiyê de hemî tecrûbeyan di yekîtiyeke idealist (ya ji formen rûhanî) de dicivîne; [yekîtiyeke] welê ku hemî xweserî û cidayiyêñ dînyaya materyalist inkar an jî biçûk dikir, nemaze laş û hestêñ me.

**Ji lewra Deleuze'yi ji her feylesofekî ku ew li ser rawestayî**  
Jî lewra Deleuze'yi ji her feylesofekî ku ew li ser rawestayî bêjeyeke sereke bijart; bêjeyeke welê ku bikare arîkariya afirandina felsefeyeke materyalist û pratîk bike. Li nik Humeyî wî fikira cemaet û federasyonê dît, li nik Bergsonî fikira cidayetyî dît. Nietzsche'yi ramana erêni û piştrastiyê da wî, û Spinozayî mefhûmê şadî û bijandinê li nik wî bi pêş de bir. Her lêkolîneke felsefi-dîrokî ya Deleuze'yi bi serê xwe niqteyeke bîriqdar e di tevkariyeke rebût de ku dîrokekê li ser felsefeya mataeryalist, felsefeya hevpişkiyê, ava dike.

Sala 1969-an Deleuze'yi du pirtûk weşandin, ku tê de cara pêsiyê ramanê wî bi xwe derdikevin pêş, "Différence et répétition" û "Logique du sens". Ev herdu pirtûk sentezek yan jî belkî pirtir lêhûrbûnek bin ji hemî avahiyê wan niqteyêñ ku wî di pirtûkên xwe yên berê de pala xwe dabûyê. Niho wî ew îdeyêñ xwe ne tenê di warê felsefi de belkî herwiha di warê matematîkî, biyolojîk û psîkolojîk de kûr kirin û di eynî demê de wî ev îdeyêñ xwe bi tekstên edebî ve girê da; ji wan ya herî balkêş "Alice li Welatê Ecayêban" ya Lewis Carrollî bû.

Gava ku Deleuze'yi "Différence et répétition" (ko digel pirtûka di heqê Spinozayî de teza wî ya doktorayê pêk dianî) li Sorbonnê pêşkêş kir ew bi profesorekî xwe re rûbirûyê berberiyeke mezin bû. Wî [profesorî] idia dikir ku berhevoka Deleuze'yi ya bêserûber û ji warêñ cida

delîlek e ku berendamî xweseriya hizirîna felsefi ji bîr kiriye. Deleuze-yî xwe parast, bi nermahî û belgeyan wî izbat kir ku profesorî bi xwe ew fêri rêzgirtina xweseriyêni disiplîna felsefeyê kiriye.

Lê cardin ji di hemî niqteyên girîng de profesor xudanheq bû. Di heqê felsefeyê de mefhûmê Deleuze-yî ne tenê ew tradisyonâ akademîk dihejand, herwiha ew ber bi aliyêne pir dûr ve dixurimî.

**D**i salêن şêstiyî de na-sitiya Deleuze-yî bi du pêngavêن bextewar re çêbû ku birh li kariyerê wî kir. Demeke kurt pişti derêxistina pirtûka wî ya di heqî Nietzsche-yî, 1962, de wî Foucault nas kir, herwiha ew jî bi Nietzsche-yî hatibû qebûl kirin. Berhemâ Foucaultî di wê demê de li Fransayê pir dihat nas kirin. Foucaultî tékoşînên mezin ji bo derêxistina karê Deleuze-yî ji tarîstanê kir. Wî di hevpeyîn û nivîsar de barana pesinan bi ser Deleuze-yî de barand û ew bi navê mezintirîn feylesofe hevdem yê Fransayê bi nav kir.



Gilles Deleuze

Foucault tê gehîst ku karê Deleuze-yî ji-nû-ve-zayîna formeke jibîrbûyî yê felsefekirinê ye: "bi navê Deleuze birûskekê ya vedayî: hişeke nû mimkûn bûye; yanî niho mimkûn bûye ku mirov bihizire".

Deleuze-yî jî ji aliyê xwe ve çend nivîsar li ser Foucaultî nivîsandin. Pişti mirina Foucaultî, 1984, Deleuze-yî lêkolînek ku rohnîtirîn û kûrtirîn analîza li ser berhemên Foucaultî ye weşand.

Çend salekê pişti hingê Deleuze-yî psîkoanalîst û siyasetvanê aktîv Félix Guattari nas kir. Guattari di pratîka xwe ya klînikî de têkiliyêne nexweşan yên azad û wekhev û metodên saxkirinê yên enteraktîv diceribandin. Wan herdûyan hevaltiyek dan dest pê kirin, hevkariyeke

intensîv bi hev re kirin ta ku Guattari di sala 1992-an de mir.

Bêguman Guattari bû ku ji bo Deleuze'î mimkûn kir ku ew karê xwe yê felsefi-dîrokî ber bi pirsên civakî û siyasî ve fireh bike. Ji bilî vê Guattariyî rengekî nû yê stilistîk da pirtûkên ku wan bi hev re nivîsandibûn. Nesira Deleuze'î ya req û zelal bi baneşanêni polemîk û terminolojiyeke tinazker û xweserane dihat nivîsandin.

[---]

Di dirba hemî jiyana xwe de Deleuze'î xwe bi pirsên estetîkî ve jî mijûl kir. Ji nav gelek kesan wî di heqê Leopold von Sacher-Masoch, Pi-erre Klossowski, Walt Whitman, Herman Melville, Franz Kafka û Samuel Beckettî de nivîsand. Mihtemelen analîza wî ya edebî ya herî meşhur pirtûka wî ya li ser romana Marcel Proustî ya ku [Deleuze] tê de şopa teoriya nîşandek û bîranînan dibîne ye.

[---]

Ka em cardin vegerin ser pîrsa profesorî ya ji dema parastina [teza] Deleuze'î li Sorbonnê. Ma qey Deleuze'î têkilî bi xweseriya hîzirîna felsefi re winda ne kiri bû?

Bi rastî jî Deleuze'î bawer nedikir ku feylesofê bi desgehê ve girêdayî rewşike awarte heye. Berevajiyê vê têt bawer kirin ku wî [Deleuze'î] keşif kiribû ku karê felsefi û vejîyandin li hemî deran berdewam e, di edebiyatê de, di hunerê tabloçêkirinê de, di sînema û jiyana rojane de.

Deleuze'î formûlasyona Gramsciyî müşexes kir: Hemî mîr û jîn feylesof in. Rojekê dikare welê diyar bibe ku ev pêkvegirêdana di navbera felsefe û jiyana rojane ya kar û afirandinê de, bibe diyariya herî girîng ya Deleuze'î ji felsefeyê re. ☐

---

Gilles Deleuze piştî problemên xeter yên bêhnkişandinê, 4-ê çiriyapaşiyê 1995-an xwe bi avêtina ji pencereya daireya xwe li Parîsê kuşt.

Ev nivîsar ji rojnameya bi swêdî *Dagens Nyheterê*, 13/12 1995, hatiye girtin û wergerandin, û hinekê jî hatiye kurt kirin.



## Çanda kurdî, rewşenbîrê kurd û pirsa nasnameyê

**E**v lêkolîn me naçar dike ku em bi Ekurtî li ser paşeroja struktûr û bingehêن civata kurdewarî û li ser gorepan û rewşa giyanî û rewşenbîrî ya vê civatê rawestin.

Em tev pê dizanin ku avahiya şaristanî ya civata me avahiyekе gundiyane ye, ta îro jî, struktûr û awayên têramandin û hîzr û baweriyêن me, di çarçewa vê şaristaniya gundiyane de berdewam in, reh-ajo ne. Hemî hêza me ya derveyîn û ya hundirîn jî bi vê şaristaniya gundiyane dilive. Bi sînorkirina vê hêzê û di vê pêvajoyê de jî, seviyeta nasnameya çanda me têt destnîşankirin.

Eger di vê çarçewê de çend kes wek ni-mûneyên xwedan seviyeteke çandeyî yî balkêş û cihêwaz (istisnayî) hebin jî, di hundirê seviyeta giştî ya çanda me de, ew kes, biyanî û bêbandor in.

Lewra ew bîr û baweriyêن ku barûdo-xên (zirûfên) siyâsî û dîrokî dikin bahane û sedemên bi şûndemayîn û astengên li ber pêşveçûna çanda kurdî ya ku xwe ferz dike, ew barûdox ji me tevan re eşkere ne, digel peydabûna çend bîr û baweriyêن cihêreng di warê destnîşankirina as-

tengan de.

Di vê lêkolînê de, wek li ser rawestaneke bi lez, em dixwazin rola rewşenbîrê kurd di kûrkirin û alozkirina wan astengêni siyâsî û dîrokî de ronî bikin.

Rola rewşenbîrê kurd di vî warî de, wek gotareke reha (xîtabeke murteq), rola çesipandina wan astengan e, çawan? Wexta ku rewşenbîrê kurd li tevlî jibermayêن ramana êlî û olî dibe, ev ramana ku îro bûye bareyeke (haleteke) siyâsî, û bi bêagahî di hişê rewşenbîrê kurd de û di çanda wî de bi cih bûye, rola rewşenbîrê kurd di vê çarçewê de, astengê ber bi astengeke dîtir ve dibe.

Lewra em dibînin ku zimanê me; ji bo xwendina cîhanê û ji bo xwendina zimanê me bi xwe jî, di vê astengê de, dorpêçkirî ye. Radestbûna (teslîmbûna) rewşenbîrekî kurd li beramberî xwendin û danûstendina bi dequekî (têkst) ramanî yan felsefi yan jî dequekî wêjeyî, bi zimanê kurdî, ji ber vê yekê tê.

Sedema wê radestbûnê jî ew e, ku rewşenbîrê kurd zimanê xwe wek proseseke berdewam ji bo gotara siyâsî û rojane û sade bi kar aniye. Herwiha, ta îro, rew-

şenbîrêñ kurd bi giştî, destêñ xwe avetiñe; tenê, wan deqêñ ku di sewiyeta çand û têgihiştina wan de bin. Ji xwe wergerandin, li cem rewşenbîrêñ me û di cîhana çanda me de, hê ji wek bizaveke rewşenbîrî li meydanê peyda nabe. Nebûna bizava wergerandinê hiştiye ku astenga zimanê me kûrtir bibe.

Serbarî vê struktûra paşmayî (aborî, zanistî, komelayetî) dîn, rola herî giring di vê paşmayînê de dilîze û bi çewtiyên rengvedana (reflection) xwe, hêdî hêdî, dibe desthilatek (sulta).

Lewra pirsgrîkêñ rewşenbîrî û zimanî, me naçar dikin ku em çend pirsên gu manhilgir, rû bi rû, pêşkêşî rewşenbîrêñ kurd ên roja îro bikin:

- E. Xanî bi hewldanêñ xwe yên mezin, bi helbestêñ xwe yên sofiyaneyî felsefiyane, bi Mem û Zîna xwe, di nava wan barûdoxêñ çetin de, di civata nexwendewar û bi şûndemayî de, li bin perêñ Imareta Botan, çawan karîbû sîma, giyan, hest û nestêñ wê komelê di nav rêz û bendêñ dastan û helbestêñ xwe de bi gewde bike, çawan dikarîbû wê kesayetiya gerdûnî bide nasnameya rewşenbîrî û bide zimanê kurdi?

- Elî Berdeşanî di serdema xwe de, çawan dikarîbû folklor û stiranê devikî yî gelêri diyari zimên bike, çawan dikarîbû laşê xwe yî şêrîn di laşê wan helbestêñ stiranamêz de bihilîne, û çêja wî laşî li ser zimanê giyanê me hetanî îro bi cî bike?

- Mehwî bi perçe Işraqatêñ xwe ku bi vî zimanî ne, çawan dikarîbû me, nifşen îro, bibe nav laşê yekîtiya hebûnê (wihdet elwicûd).

- Li vê tarawgehê (sergumgehê, menfa-yê), ku giyanê me yên tîbûyî tîna xwe bi helbestêñ dûrketina ji Hebîbe, helbestêñ namoamêz (Ixtîrab) ên Nalî dişkînin, ge-lo çîma digel van ezmûneyên kûr û tevlî-hev ên jiyana tarawgehê, hetanî iro, li gor serdema Nalî, çîma em di çanda xwe de pêrgî helbestekê yan deqekî pexşanî nabîn ku bikaribin toza tarawgehê ji ser giyanê me daweşînin?

Pirsên jorî û çend pirsên dîtir ên wekî wan, me datînin ser duryana gumanekê dualî, bi awakî ku vê lêkolinê ber bi afirandina gumanan û pirsên dudil de dehf didin.

Eger aniha em li nik sînorêñ ezmûneyên çanda navnetewî rawestin, em dê pêrgî gelek ezmûne (tecrûbe), bîr û baweriyên felsefi û ramanî û rexnekârî yên nûjen ku li hemberî ramanêñ ideolojî yên siyasi û olî radiwestin, bibin. Wan ezmûneyên navnetewî asoyêñ bêkutayî bo rewşenbîran û çandê vekirine. Lî meyda-na hişyariya rewşenbîrê me ta îro ji, hê ji di warê çandeyî de bi wê cîhana bê bizav ve girêdayîye.

Ji bilî çend rewşenbîr û çend deqêñ ku li ser tiliyêñ destekî têñ hejmartin, ku wek diyarde, di hundîre vê xeleka reha û giştî ya çanda me de, biyanî ne, dîmena giştî wisa dixuye, çînkî çanda me bi xwe li ser struktûrêñ diyaloga hestêñ sade yên ku wek bersivdaneke reha, ji dîn û ji siyasêtê hatine, hatiye damezirandin. rewşenbîrê me ji da ku vê zemînê berfirehtir bike, hewl dide ku şêweyê nivîsandina xwe bi awakî sozamêz (atîfî) û stiranî pêk bîne da ku hestêñ sade yên xwendevanêñ xwe

bidiqdiqîne.

Lewra, li vir, pêwist e em pirsekê ji rewşenbîrê xwe bikin:

Eger em rewşenbîrê kurd ji hişyarî û nasnameya wî ya siyasî û rêxistinî rût bikin, dê teorî, bîr û bawerî, rêberiyên fel-sefi û wêjeyî yên ku çanda rewşenbîrê me çedîkin, ci bin?

Eger rewşenbîrê Kurd bixwaze di warê rexneyê û zanistiyên psîkolojî û wêjeyî û rîbazên analîzê de lêgerîn û lêkolînê bike, ji derveyî bersiva siyasî û sadeyiyê û têkperîn (infîal) û slogan û duruşmeyên ku di çanda me de kom bûne, dê kîjan teorî û biran (Burhan) alîkariya wî bikin?

Ezra Pawend (E. Pound) dibêje: "Eger em tiştine nû nedîn xelkê, tiştine ku pê nîzanibin, dê tu carî meydana zanebûna wan berfirehtir nebe.

Necihêkirina gotara civakî ji ya çandeyî, bi serê xwe, beşek e ji astenga zimanî ya çanda me. Mebesta min ew e ku zimanê rewşenbîr gerek ji zimanê civatê ci-hê be; çunkî xwegirêdana bi gotara civakî, di bingeha xwe de, xwegirêdana bi wê gotara xerîzî û rimakî û kevnesopî ye, ku desthilatdariya bêbizav a civakî û siyasî ye. desthilatdariya ku di neagahiya gişti ya rewşenbîrê me de û di aqil û gorepana berdewamiya me de kom bûye.

Rewşebîrên ku di vê çarçewê de per-werde bûne, li dijî pirs û dahênanâ ku ji derveyî wê desthilatdariyê têr, radiwestin.


Lewra gotara me ya civakî bi rewşa me ya siyasî û dîrokî re xweş digunce û pirs û gotara rewşenbîrê me jî di vê hêlê de ber-dewam dibe.

Di baweriya min de, mirov dikare rewşenbîrê Kurd bi giştî bi vî awayî bide na-sîn. Lewra, lêpirsîn û xwendin û destnîşankirina nasnameya rewşenbîrê kurd, ci li hundir û ci jî li derveyî welêt, giringti-rîn erk e, xemsariya di vî warî de dê kûrkirina asteng û pirsgirêkan be; dê kûrkirina pirsgirêka nasnameya rewşenbîrê Kurd be, ji alîkî ve, û dê kûrkirina wê desthilatiya ku me li jor nivîsandiye, ji alîkî din ve, be.

Lewra ci hewldan ku ji derveyî liserra-westan û hûrlêtemaşekirin û têgihişin û analîzkirina û pirsiyariya li hoker û sedemên astengên civakî û siyasî û dîrokî û aborî û olî, dest pê bike, dê vegera he-man baweriye, mebesta min baweriya gel-emper i reha û bêbizav e, dê rewşenbîr jî ber bi tenhatiya xwe de vekêse, ber bi tenhatiyê ve vekêşana rewşenbîr jî, wek serencam (netîce), egoystiyekê nexwes pê re peyda dike, îca vê carê li dijî pirsên raperînxwaz û li dijî dahênan û afirandînê radiweste. Li beramberî yên dîtir he-man astengê bi kar tîne. Evê bi xwe jî hiştiye ku hemî hewldanê dahênanê têkbiçin û di cynî wextê de jeografyaya çandeyî ya kevnar û genî bête parastin.

Bi vê pîvanê em dikarin taybetmendiya (xisûsiyeta) kesayetiya(şexsiyeta) taybet a rewşenbîrê xwe binasin, kesayetiya ku bi rehêن xwe dighêje qonaxa desthilatdariya olî ya kevnar û palpişta wê ya gundiyanê û dualîtiya bersiva siyasî ya efsanewî û xemgîn. □

*Di hejmara qan de ev lêkolîn berdewam dibe.*



## Girê Mozan

### Cih

Vekolîna li Girê Mozan ji sala 1984an ve di bin birêvebiriya Marilyn Kelly-Bucellati û Giorgio Buccellati de berdewam dike. Xerîte piraniya cihê vekolinê diyar dike. Di-rejayıya girê bilind nêzîkî 600 metrî ye, bajar û derdora wî nêzîkî 1500 metrî ne û bilindayiya gir ji erdê 28 metr e. Li gor vê êdî ev cih di dema boşıya xwe de dibe yek ji mezintirîn cihan li tevayıya Sûriyê, di sê hezarê salên sisiysan de yên berî zayînê. Ji bilî mezinbûnê rasitiyke dinî balkêş, ya Girê Mozan heye, ew jî homojeniya radeya niştecihbûna wê ye: weke ku em dibînin, delilên dariçav, yên niştecihbûnê vî cihî diyar di-bin, ji serê gir bigire ta binê wî û ta derdorêne derve yên bajêr jî, hê ji sê hezarên sisiysan ve yên berî bayînê.

## Herêm


Deşta Xabûr li rojhilate Sûriyê roleke sereke di pêş-veçûna avakirina bajarvaniya kevn de leyistiye. Dibe ku di hin radeyan de bûbe hemberê bajarvaniya bilind, ya Sûmeran li deşta heryane li başûr. Çandinî yek ji faktorên vê pêşveçûnê ye. Herêm weke îro, di heyamên berê de jî bi xêr û bêr bû. Çandiniya bi ava baranê her û her têrê dikir û pêwist nedikir, ku cotkar zeviyên xwe avbidin. Bi saya vê axa bi bereket, bajaren nû peydebûn, û hê di destpêka dîroka şaristaniyê de ev bajar mezinbûn. Bajarên mezin weke Chuera,

Birak, Mozan û Leylên şahidên diyar, yên vê yekê ne.

Mirov dikare bi ewlekari bibêje, ku sederma sereke ya mezinbûna hêza bajarekî weke Girê Mozan, cihê bajêr bû. Ew cih kilita bazirganiya di nav çiyayên Anatoliyayê de, ev çiyayên bi madenê sıfır (û dibe ku bi pîlê jî) zengîn û di nav bajarvaniya mezin de, ya li başûr bû. Di vî warî de çiyayê Mêrdînê, yê di dîmenê Mozan de pir dariçav e, nîşan e; hejmara mezin, ya tiştên bronzî, di vekolînên me de, dibe ku delîlên giringiya Mozanê kevnare bin, çawa ku dergehê bazrganiya maden bû di dîroka Sûriyê ya kevn de.

## Dîrok

Weke hîpotêza kar, em goman dîkin ku Mozan digehe bajarê kevnar Ûrkîş, yê ku li vê herêmê diket û ji mêt ve tê goman kirin, ku li cihê girê bajarê Amûdê be. Ji dema ku me karîbû, em xwe bispêrine rastiya, ku girêdana Ûrkîş bi girê Amûdê ve şas e, em dibînin ku hemû argumentên ji bona Amûdê û Ûrkîş hatibûn bikaranîn li ser Mozan (ku li nêzîkî Amûdê girê herî mezin e, yê ji dema sê hezar salî ve b.z.) û Ûrkîş pêktên. Tevlî ku armanca vekolînên piştre ew bû, da diyar bikin, ku Mozan ne Ûrkîşa kevnar e, lê dîse ev cih û profilê navenda Hüriyên kevnare li hev tê: Hiskere ye ku Mo-




zan sê hezar salên b.z. gehabû radeya xweyî bilind, û du hezar sal b.z. melûl bûbû û dawî gişt di nîvê du hezarsaliya b.z. de wêran bûbû.

Sê hezar salên b.z. heyama Ebla li rojava ye, û heyama Marî û Sûmeran li başûr e. Dibe ku rengekî taybetî ji çanda wêyî materyalî (arkîtektûr û nemaze sîramîk) bi destpêka bajarvaniya Hûriyan ve girêdayî be, çaxê ku Ûrkîş weke navenda siyasi û olî, ya sereke dihate naskirin. Di hebûna bajarvaniya Hûriyan de, ya sê hezar salan b.z. de hinekî dîtinêن cuda hene. Lîbelê dawiya dawî ku mirovêن heyamên berê, yên li Mozan dijîn bigehine ci resenî jî, dîse rastî ew e, ku li vir bermayêن bajarvaniya sûrî ya kevnar darîçav in.

5000 sal b.z.	Till Halaf
4000 sal b.z.	destpêka Birak û Leylêن
	bandora Sûmeran
3000 sal b.z.	destpêka Mozan û Chuera
2500 sal b.z.	sûrha bajêrî hundur li Mozan
	serê girê Mozan
	pûtxana BA li Mozan
2300 sal b.z.	Akadan Birak bindestkirin
1800 sal b.z.	Heyama Xabûr: Herêma C1 li Mozan
	serê girê Marî û Leylêن
1500 sal b.z.	Heyama nûzî: Herêma BH li Mozan
	wêranbûna Mozan

## Sûrha bajêr

Di bingeha jêr de, girê bilind bi sûrheke mezin hatibû rapêçan. Me li du cihêن gir, yên cuda vekolabû, herêma K û Sî. Mixabin, ku ew li ti deran bi mezinaya xwe, ya ku bêgoman di wextê xwe de çavêن serdanvanan didagirt, nayê dîtin.



Dîwarêن sûrhê gelekî stûr bûn, ew ji kelpîçan hatibûn avakirin û dibe, ku bingeha wê gehabû latê (hê dive bi vekolanê were derxistin), û bircêن zêrevaniyê jî li hawîrdor di sûrhê de hatibûn avakirin. Kaşekî bilindî lihevhatî jî nav bajarê nizim dirabû û digeha

binê sûrhê (çawa mirov bi rengekî ferehtir di kelehêن heyama navîn de dibîne, weke li keleha bi nav û deng, ya Helebê); di dora vî girî de, dibe ku sengerekî ferehî tijî av jî hebû, lê eger wilo be jî, hê em di vekolanîn xwe de negehanê. Dereng, di dawiya sê hezar salêن b.z. de, xwiya dike ku bajar tev dikeve bin rûdana jibirkirinê, ji wê jî hew erkê parastinê yê gir dimêne û senger bi ax û kevirên ji avayiyêن bajêr, yêن hêrivtî tê dagirtin. Di parçê, ku me kolayî de, me kavilê embarekê dît, ew ji cihekî ji hundurê bajêr hatibû dagirtin û bi xitmeke giring hatibû muhrkirin, dibe ku xitma li ser derî be, dema wê jî ji nîvê sê hezarê sisiyan yêن b.z. ve ye (Destpêka Xanedaniya III).

Ji ber berdewamiya ferehbûna demografi, gerek e bihatana xwiyakirin, ku sûrheke din di wê demê de li derbedrê bajêr hatibû avakirin: di vî warî de lêkolîn ne bi miso-gerî hatine piştrastkirin jî, lê ferehbûneke ku dora bajêr tev dorpêç dike, tê dîtin. Di her radeyê de bêşik e, ji lêkolînêن me û ji lêgerînêن li herêma derveyî bajêr, ku ew jî parçekî ava bû ji bajêr, û ku ew jî tevayıya girê bilind ji heyama sê hezarêن sisiyan yêن b.z. ve ye. Li herêmekê li derveyî bajêr, goristanek hemdem hate dîtin û tê de jî komike giranbuha, ya firaxêن ji sıframîk û bronz hatine dîtin.

### Peykertiraşıya hezarsalêن sisiyan b.z.



Di cihekî şewitî de, hema hinekî li piş mihraba pûtxanê, me peykerê şerekî dît. Peyker ji kevn bû û li gor delîlên stratigrafi ew ji nîvê hezar salêن sisiyan yêن b.z. ve ye. Peykerên şêran di embarên peykerên Sûmeran de têne dîtin, yêن ku adetên wan yêن hunerî ji heyama şêrê me ne, lê stîlê wan ji hev cuda ye. Sûmeran şêr bi riheke darîçav dineqîşandin, ew rih bêhtir weke berstika cilêن heyama navîn bû, û kêm weke pirça ber sînga şêran bû. Gelekî stîl didane çavêن şêran, weke ku yêن hunermend ti caran şêr nedîbin! Dibe ku şêrê meyî Mozan ne weke yê hevrikê xweyî basûr şahîk be, lê ew ji wan bêhtir weke şerekî rastî ye. Neqsên pirça sînga şêrê Mozan, tevlî ku hinekî gjîjol e jî, lê ew weke pirça rastî xwiyadike, lep bi xwe jî hatine neqîşandin. Bi gelemerî mirov yekser di şêrê Mozan de têkeliyê di nav spehîtiya hesan û jîndariyê de dibîne, ku ew têkelî li derên din, di wê heyamê de kêm bû. Dibe ku bi tenê du şêrên ji Úrkîş, yêن niha li Motropolitan û Louvreyê ne dikarin bibin hempayê şêrê



Mozan. Ev şêrên bronzî bi awayekî reyalîtit hatine neqişandin û bi destên peykertiraşen jêhatîtit hatine çêkirin, lê mirov di wan de şengî û jiyan-dariyê, weke ya di şêrê Mozan, dibîne.


Li herêma pûtxanê ferşekî kevirî hate dîtin, ew ji her dû aliyan ve neqişandî bû. Li ali-yekî vî abîdeyê bi serê xwe, neqşandineke neadetî hebû, ew komeke lawiran bû, hemû jî di haleta lebatê de bûn. Ev jî cudabûneke tûj di nav mijara lawirêna xâckirî de, yên ji aliyê hunermendênu sümmerî li başûr dihatin neqişandin. Li cem wan lawir ji ber teşeyê xwe giring dihatine dîtin, ji ber vê yekê jî wan ew bi awakî simetrî û gelekî bêliv bi cih dikirin. Di ferşikê me de neqs ne bi bang, lê bêhtir bi awakî xwezayî hatine çêkirin, ew jî dihêle mirov biheste, ku ev komek ji garana lawiran e.

Bi mijara xwe, aliyê din ji ferşik hê balkêstir e. Yekî cotkar, haletê wî li pey dewarêni cot di dest de ye û kûçikek di ser re hatiye danîn. Cotkar di dawiya dîmenekî de hatiye danîn û li pişt wî cihekî ferehî vala hatiye hiştin. Ev herêma ferehî vala, xêzen qu-rçikî, yên ber bi jêt de beldike. Tişte din jî yê ku dihêle ew bêhtir dramatîkî be, lingê cotkarî ji erdê tê hildan e, ew weke ku ji qurçikê hatibe. Ev berveçûna bi pêş de, bi ling, laş û serê cotkar ber bi pêş ve hê xurtir dibe û lebt di lingêne dewer de jî xwiyadi-ke. Dîmenê ji ferşikê Mozan bi levanîna xwe, gelekî ji hunerê hevrikê xwe li başûr pêşketîtit e, yên ku li ber xwe nedidan lebatê bi awakî wilo dramatîkî bineqişenin.



## Seramik

Dema sîramîkê pêşî ta yê dawî, ku li Mozan hatine dîtin bi tenê drêjayiya hezar û pênc sed salî dikişêne. Sîramîkên herî kevn ( destpêka sê hezar salên b.z.) firaxên xwesikî rengê pirteqanî bûn, ew ji hudurû ve neqîşandî bûn (weke ku li jor tê dîtin). Ji ber ku cara pêşî Sir Mallowan ew li taqê kûr, yê pêncan li Nînewa dabûn naskirin, êdî navê Nînevîte V li wan hatibû kirin. Teşeyên pêşî, yên firaxên hatibûne çêkirin, cêr bûn û piyaleyên piçûk bûn, ku dibe ji bona vexwarinê dihatin bikaranîn. Pişt-re cêrên mezintir dihatin çêkirin, lêbelê êdî ew nema ji wê kîla baş bûn.




Di dema dawiya Nînevîte V de, berhemekî nû ji sîramîkên gelekî rind dihate çêkirin, ew bi Firaxên madenî bi nav dibûn, ji ber ku bi şewtandina kîlê rengê alavênen madenî bi wan diket. Firaxên madenî li vê herêma Xabûr hatine afirandin û pê bazirganî bi bakur û başûr re dihate kirin. Firaxên bi vî rengî li herêmeke fereh têne dîtin. Texlîtekî din ji sîramîk li herêmê bi ferehî tê dîtin, ku êdî navê Firaxên xabûrî lê bûye. Ew texlît digehe destpêka du hezar salên b.z., û ji ber kemberên ferehî ji rengên qaweyî û sorî tarî li dora firaxan, ew hesanî têne naskirin.

Di nav sîramîkên herî dawî de ( ji nêzîkî sala 1500 b.z.) piyalên risimandî hene, yên bi navê Firaxên nûzî hatine naskirin û ew gelekî, ci li qesr û qûnaxan û ci li avayiyen cemawerî be, her li bareş û her li baxerbê Mozan jî peyde dibin. Ji ber ku ev heyama dawî ye, ya niştevaniya Mozan, êdî ew nema li herêmê têne dîtin, lê teşeyên wan nazik in û motîvên wan xweser in (li jor xwiya ne) .

## Pûtxana şêr

### (Pûtxana BA)


Avayiya sereke di gir de hate vekolan: emê nefermî navê " Pûtxana şêr" (nîşana fermî "pûtxana BA" ye) li gor peykerekî piçûk, yê şêr ku li cihekî bel di hundurê avayiyê de hatibû dîtin, lê bikin. Fazên destpêkî, yên avakirinê (Faza Aşa), ku hema bêje bi teva-



yî di vekolînan de hatiye vekirin, mirov dikare bigehêne nîvê sê hezar salên b.z. (Destpêka Xanedaniya III di mijara Mezopotamiya de). Ew struktûreke mezin e (15 x 24,5 m), mirov ji başûr di ser rampeke bêdûzan re derbasî wê dibe. Serdanvanên derbasî eywanê dibûn divabû di rêke gelekî kûr ve herin, hingê bala wan diçû ber bi rexê rastê ve, li wir li cihekî hinekî navendî, lateke mezinî (gişt 1 x 1,5 m) stûnî hatibû da-nîn. Xwelî di kortikeke di serê wê de hate dîtin, û cokek jê diherikî nav cêrekî ku di erda xênî de hatibû çandin. Tê gomankirin, ku ew masa pêşkêskirina gorîyan ji xwendê re bû.

Guhertina modelê berê bû sedema avakirina du dîwaran li pey hev, û ber bi dawiya wê eywanê ve. Dîwarê pêşî zirav bû û ji kevir bû, ew yekser li pişt masa gorîyan bû, û yê mezin ji kelpîçan bû, û nêzîkî dîwarê paş bû. Ev dîwar di şûna perda pişt şanoyê de bûn (faza A1b, li planê binerel!). Peykerê şêr nêzîk li banî di nav kavilê dîwêr de hate vedîtin, û dibe ew di pûtxanê de di nav koma peykerên, ku nûneriya payebilindîya xwedê dikirin be. Herdû dîwarên dirêj, yên pûtxanê nêzîkî 1,6 metrî stûr in, û herdû yên kin du caran ji wilo stûrtir in. Dîwar ji kelpîçan hatine avakirin û bingeha wan gehaye latê. Berazên pala dîwaran û bircên anîşkan avayiyê bi hêz dikirin û ev hemû didine xwiya kirin, ku dive di asoyê heyama kevnare de, ew be cihê desthilatdariya bingehî li herêmê. Nêzîkî 100 parçêن bronzî li herêma pûtxanê hatine dîtin.


Erê, ne bi gewdê xwe, lê Mozan "Pûtxana şêr" li Sûriyê ji wê heyamê ji yên herî mezin e, ferehiya wê gişt weke, avayiya Pûtxana D li Ebla û Aussenbau û Steinau I li Chuera ye (dibe ku ew ji weke pûtxanên tipêن atîs bêne hijmartin). Lê di wextê ku pûtxana Ebla li gor stûrbûna dîwarên xwe ji hundurû ve gelekî zirav bû, avayiyên Mozan (dibe ku Chuera ji) ji hundurû ve gelekî fereh bûn (gişt 9 m fereh). Ev kêseya avakirina banê xênî derdixe meydanê. Ji nû ve avakirina avayiyê, li gor lêkolînen kûrî



endazyarî, dipejirênin, ku dibe formeke destpêkî, ya banêن sêcikî hatibe bikaranîn (çawa li jor tê dîtin).

Sê fazên din, yên avakirnê hatine naskirin, ya dawî ji heyama Xabûr ve ye (nêzîki 1800 b.z.). Vê yekê kir ku danîna avayiyan bi awakî radîkal were guhertin, dibe ku bi rastî ev be sederma ku êdî ew hê ji dawiya sê hezar salêن b.z. ve, hew weke pûtxanê hatibe bikaranîn.


Di vekolinêن bi sînor de, çend srtuktûrêن piçûk li herêma bakur û rojhilatê pûtxanê hatine dîtin, dibe ku, ew bi erkê xwe bi pûtxanê ve girêdayî bin û dibe, ku ne wilo be jî. Li cihekî ji wan, ew ferşikê bi dîmenê cot û cotkar neqîsandî, û yê garana dilivî hatine dîtin. □



# h

ELBEST

DILOWER MÊQERÎ



## Ala Mîdiyan

Ey pêximberê AHORA yê pîrozmend  
 Ji asitankên deştan ta banê gerdûn  
 ji bili ala ku me ji boyî hetavê li ser  
 [kupîtka ZAGROS daçikandiye, tu yê nebînî.  
 Li vir, dê baskên wê, bi bagera rexên zemîna  
 [ku me dagîrkiribû bêtin libakirin,  
 dê netewe serên xwe li ber bitewînin,  
 [neteweyênu ku em navênu wan nasnakin,  
 lê ew me ji ber babelîska bazan dinasin,  
 Bazên; ku aso nixumandibûn,  
 da ku li ser kavilên Aşûr ên ku  
 li ber simên êrişa me tar û nar bûbûn, raperin.  
 Ey pêximberê AHORA!  
 Tenê,  
 em radestiya xwe  
 li beramberî Xwedayê te eşkere dikin,  
 parastina wî ji me re pêdivî ye,  
 lewra  
 dê bi dadana şevê li ser Olimp û  
 bi rijandina denên meyê bi ser  
 Gitarâ bedewiya Igrîkiyan de, barê me giran neke.  
 Bi navê AHORA dê jin-keşeyên Dilfiyê xwe biçemînin  
 û da ku  
 werzên wan ên (lehnet lê hatî) bibîşkîvin,  
 em dê heft serdestên xwedî rûmet bikin bi qurbanê inirîna wî.  
 Lê ev giş; dê negîhişa kutayıya xwe ku ne



ji ber gernameya serfiraziyê bûya  
Gernameya ku ji sernîşîvbûna me yî bahozane dest pê kir  
şahinşahiyên tirsayî talan dikir  
Jinên xwe davên bin lingê méraniya me  
Me guh nedida denêr zêr û gencineyên perestgehan  
û ne ji me guh dida qîzên qîz da ku  
bejnên serkeftinên me bi gulan bixemilînin..  
Afsana Xwedanên wan ên tirsayî  
Pût û peykerên ku bi zingezinga qazmeyan diherifin,  
zingîna serbilandahiya li erdê  
li esmanan rengvedida.  
Hemî babetên Xwedanan bi lerz  
zigînî werdigirtin, gişan  
dergehîn razen xwe li ber keştiya hetavê vedikirin  
Bi koteķi, xwe li pêşıya AHORA Xwedanê şivanan, diçemandin  
û li ser zemînê ji  
ala wî, ya bi tenha, wek bazekî  
xwe li ser ZAGROS li ba dikir.





## Dilbijokiyeye xerab\*

**D**i hejmara *Nüdemê* ya dawî de (hej. 15) li ser şes nivîskarên "Sovyetî" yên dema Stalin (O. Mandelstam, V. Mayakovskî, M. Tsvetaya, Gorkî, İ. Babel, İ. Meyerhold) "nivîseke" Suleyman Demir heye. Gava, meriv zeîfi û çewtiyên zimên bide alîkî, nivîs ji alî informasyonê ve gelekî dewlemede. Bi taybetî li ser terora rejîma Stalin ya li hember nivîskar û kesên muxalif muhalifên rejîmê), gelek agahdariyên nuh û neînsanî tê de hene ku gava meriv dixwîne meriv ji ber însaniyeta xwe fedî dike. Îcar ji ber ku ev agahdarî hemû belge û raporên arşîva polîs in, (KGB) lema jî bêtir tesîrê li meriv dikin. Ya din, kesên li xwe mukur tên jî ne kesên muxalif in, ew xwedî û parêzgerê sîstemê bi xwe ne. Ev yek jî tesîr û baweriya bi nivîsê zêdetir dike.

Bi weşandina nivîseke wiha bêguman Suleyman Demir karekî pîr baş û hêja kiriye. Lê li alî din tiştekî xerab û nebaş jî kiriye ku rabûye nivîsa xelkê kiriye ya xwe. Bi gotineke din, nivîs ji wergerandîye kurdî û wek nivîskarê nivîsê imza xwe avêtiye binî. Xwezî wiha nekira. Helbet ji alî ehlaqî ve ne raste ku meriv rabe li ked

û xebata xelkê xwedî derkeve û bike malê xwe. Bi ya min ya rast ew bû ku divê wîne wek nivîskar, lê wek wergêr navê xwe li binê binivîsanda.

Ez dizanim gelek caran dilê meriv dibije hin berhemên lawên bavan, meriv dibêje xwezî ev ya min buya, ya jî min jî kanîbuya tiştê wiha bi mustewa biniyîsanda. Ez dilbijokiyeye wiha baş fam dikim, ji ber ku hisekî însanî ye. Lê ev yek nayê wê maneyê ku her dilê tiştê meriv bijayê merivê rabe bike yê xwe. Ger wiha be her kes dikane bibe nivîskar.

Nivîsa ku Suleyman Demir wek nivîskar imza xwe avêtiye binî beşek jê ya Bengt Jangfeld û beşek ji ya Arkadij Waxberg e. Nivîs di kovara *Artes* (hej. 4/1994) de bi sernivîsa *Polisarkivet* (Nûçeyen ji arşîva Polîs) hate weşandin. Swêdiya nivîsê bîst rûpel in.

Min "nivîsa"(!) Suleyman Demir û ya kovara *Artes* dan hember hev, tiştê min dît tiştekî ecêb bû, bêyî çend gotinên pêşî û di nav re û hin agahdariyên ensiklopedîk yên li ser şexsan hemû nivîsa *Artes*'ê piştî tercumeyê bûye ya Suleyman Demir. Meriv naxwaze ji çavên xwe bawer bike. Lê nexwestin ya jî bawernekirin ne-

tîcê naguherîne, nivîsên B. Jangfeld û A. Waxberg di *Nûdemê* de xwedî guheradîne, bûne yên Suleyman Demir. Him jî teqrîben bîst rûpel.

Ez tê nagihîstîm, însan çawa dikane li hember ked û xebata xelkê hewqasî bê-hurmetiyê bike? Ma ne neheqî ye ku meriv rabe xebata xelkê bike ya xwe? Ka xwedêgiravî em mirovîn demokrat, adil û heqşînas bûn û xwedêgiravî me tecawuzî mafê xelkê nedikir? Wer xuyaye ku gava keys di destê me keve em jî dikanin wek gelek kesan devê tevî hawud daqultînin.

Tîstê Suleyman Demir kiriye tiştekî pirr orjînal e; hetta dikanim bibêjim ku ji dunyayê der e. Wî him li alîkî nivîsa camîran kiriye ya xwe, yanî bi îmza xwe weşandiye û li aliyê din jî bi rengekî tevlîhev gotiye nizanim nivîs ne tercume ye û ne jî ya min e. Helbet ev tîst jî bi zanetî li bin guhê hev xistiye. Qey jî xwe re gotiye, gava rojekê yek rabe li min rexne bigre ezê bi van çend gotinan xwe biparêzim û bibêjim ku ji xwe di nivîsê de min gotibû. Lî bi ya min ev tedbîr jî bi tu hawî barê S. Demir sivik nake. Ji ber ku lixwemukurhatin ne sûc sivik dike û ne jî karakterê hedîsê diguherîne.

Wek tedbîr, li hember rexneyeke muhâtemel tîstê S. Demir gotiye ev e:

— Divê ez bêjim ku min nivîs tercume nekirine, lê min ramanê nivîsan tercume kirine. Min ne hemû derxistine, min yên balkêş derxistine. Heta ku ji min hatiye, min raman û naveroka nivîsan ne-guhertiye. Loma jî ez nikanim bêjim ev nivîs yên min in. Lî hinek tîstên ku min

berê di vî warî de zanîbûn, ji bo ku bûyer baştır bêñ famkirin, min xistine nav.

Nuha gava nevîs ne tercume be, mana xwe ew e ku ya te ye. Nabe nivîs him ne tercume be û him jî ne ya te be. Wê gavê ya kê ye? Û piştî ku ne ya te ye çîma te bi navê xwe weşandiye ? Û bi ci heqî?

Diyar e ku S. Demir ji bo bidestxistina argumentên maqûl xwe gelekî êşandiye, lema jî gotiye min ne nivîs lê ramanê wan tercume kirine. Lî ez bi xwe nizanim "tercuma ramanê nivîsan" tê ci maneyê? Ne nivîs lê ramanê (fîkrê) wan?! Axir li gor îddîayê em dikanin fahim bikin ku nivîs ne tecume ye. Lî ya xerab, di eynî paragrafê de ew bi xwe vê îddîa xwe pûç dike, dibêje "ez nikanim bêjim ev nivîs yên min in."

De werin viya ji hev derxin, nivîs him ne tercume ye û him jî ne ya wî ye, lê dîsan bûye ya wî, çimkî bi îmza wî hatiye weşandin. Nuha rastî ew e ku S. Demir kovar daye ber xwe, beşen kêfa wî jê re hatiye û ew girîng dîne û kanîbûye wergerîne, wergerandiye. Ü beşen girîng nedîye ya jî tercuma wan zor bûya di ser re gav kiriye, wernegerandiye. Mesele hewqasî vekiriye.

Tîştekî din yê ku meriv dibe dunya wiyalî ew e ku gava S. Demir dibêje, ji bo ku bûyer baştır bêñ famkirin min hin tiştên xwe kirine nav. Bi rastî ez tê nagihîjim meriv çawa dikane hewqasî basît bifîkire. Heval S. Demir piştî ku di vê mustewayê de bi edebiyatê mijûl dibe divê hin usûl, qâide û prinsîpên "neqilkirinê" bizanibe. Helbet mafê meriv heye ku meriv ji xelkê neqil bike. Lî bi wî şertî ku

gava meriv ji nivîsekê tiştek girt, divê meriv bi zelaliyeke xweşik nîşan bide ku meriv çi û ji ku derê girtiye. Gava ne wiha be, wê gavê hemû kitêb û nivîsên dunyayê dikanin bibin yên mîriv. Hema dilê meriv kîjan nivîs eciband merivê çend gotinên xwe jî di nav ke û bike nivîsa xwe. Lê ne usûl wiha ye û ne jî kes wiha dike. Yan jî bi kîmasî bêyî me kurdan di civateke din de kes wiha nake.


Ne tenê ji alî huqûqî, her wisa ji alî exlaqî ve jî meriv mecbûr e ku tişte ji xelkê girt bi hawakî xweşik destnişan bike. Lê S. Demir tu mecbûriyetekê wiha his nekiriye, bi yek îşaratekê jî nedaye xuyakîrin ku ka kîjan beşen nivîsê "yên wî" ne (!) jê û kîjan jî yên xelkê ne. Û dawiya dawiya "yên wî"(!) jî û yên xelkê jî giş bûne yên wî. Esas tu tiştekî wî yê muhîm di nav nivîsê de tuneye û nikane hebe jî. Ji ber ku S. Demir ne bi rûsî dizane û ne jî wek wan camêran çûye ketiye arşîva

KGB'ê û hemû belge û raporê polîs tettik kirine. Bes xwediyên nivîsa swêdî ev kar kirine. Lê em qebûl bikin ku wî hin tişt lê zêde kirine, ma ne divê ev yek bi-hata diyarkirin. Ya ev herdu nivîskar sibe bibihîzin ku meqala wan di *Nûdemê* de bûye ya S. Demir, gelo S. Demirê ji wan re çi bibêje? Ez bi xwe meraq dikim.

Ji bo dana ber hev ez kopiya meqala li ser Îsaak Babel û ya Osîp Mandelstam dişînim. Gava hewce hat dîtin meriv dikane ji wan hin beşan biweşîne. ☐

---

\*Min dixwest ku ev nivîs di *Nûdemê* de bê weşandin. Ji ber ku nivîsa min rexne kiriye di wir de hatibû weşandin. Lê ber repersiyarê *Nûdemê* ji min hin guherandin xwest û min jî ew guherandin qebûl nekirin. Lema jî ez wê di *Dugirê* de diwêşînim.






## Peyvîn xewê

*Ji bo Farahnazê*

Dengê tirumbêlekê hat • Ez rabûm • Min cigareyek hilgirt • Te xwe zîvirand • Bi dengê textû re min dizanî • Min çeqmaq vêxist • Hinarika memka te ya çepê diyar kir • Porê te lêva te û memka te veşartibû • Min viya bi hêdîkî porê te bi du tiliyan hilgirim • Te destê xwe danî ser çavê xwe: "Li vêderê cigarê mekêse." • Dengê kenê çend ciwanan ji kuçeya şevê hate guha • Min çeqmaq vemirand: "Serkwes in, bi şevê re hatin hetanî nîvê rê û dê biçin razên hetanî navqedâ rojê." • Ez çûm li mitvexê rûniştîm • Min cigareyek derxist • Min çeqmaq vêxist • Dengê tirumbêlekê hat • Dayika min got: "Min go belkî bavê te bit, meyt anîn û li heywanê danîn" • Min cigareyek vêxist: "Dengê anîna meytan tarîtiya şevê tarîtit nekir?" • Reyîna segan hatibû guha • Dayika min got: "Ma dixwazin van meytan di hewşê de veşîrin? • Ma ne baştire ku li serê girekî yan jî li binê newalekê?"

Dema ez li metvexê rûniştibûm û min cigare dikêsa li bîra min nebû lê aniha ku dînivîsim hîzir dikim: Ji bo hildana por ji ser hinarika me-mikeke razayî binê newalê çêtire yan jî serê girî • Dengê tirumbêlekê hat • Dar û barêner herdû aliyên rê serê xwe li ser milêñ hevûdû danîbûn • Dema cigareya min xelas bû di hizra min de bû ku diranên xwe bişom • Min bîna xwe ragirt • Dengê xewa te dihat • Li derve,, di navbera darçinarêner herdû aliyên riya terr a li pişt pencerê ba û baran bi hev re dibûrîn • Min got: "Binêre çend ciwan e." • Te serê xwe bilind kir: "Çî?" • Min got: "Ta û çîqulên wan gihiştine hev têkalyayî-

ne.” • Te got: “Lê pir dereng, binêre, li ber têhna hêviya wan qîra cadê ji qeliye.” • Min cigareyek derxist • Te got: “Xwe bide aliyekî tirumbêlek hat.” • Tirsê ez şiyar kirim, destê min girt û ez birim ber pencerê û bi du tiliyên min perde hilda • Dengê bavê min tariyatî qelaşt: “Eger ditîrsî here, eger natîrsî binive.” • Şeva hewşa me pir bû ji bêhna pirtûkên şewitî • Dengê tirumbêlekê hat • Di dirêjahiya şevê de û di derzê tariyatiyê de meyt anîn • Meyt terr bûn • Bêhna hilma cilêñ zindiyan û bêhna birîna laşê terr ê miriyan dihat • Dayika min got: “bavê te got şîrê tirs û lerzînê nede vî zarokê bê ziman!” Dengê tirumbêlekê hat • Min got: “Dayê ma destê xwe jê re bilind bikim?” • Got: “Kurê min eger min û te nebînin ji bo dîtina destê te ji kor dibin.” Deng hat • Bû tirumbêl • Derbas bû û aliyek ji eba reş a dayika min kesk kir • Dûrî me rawestiya • Dayika min got: “Dev jê berde em siwar nabin.” • Çirêñ paşin ên tirumbêlê vêdiketin û vedimirin • Te got: “Hizra ci dikî?” • Min got: “Belkî demeke dî...” • Te got: “Êdî dereng e!” • Ev bîranîn zer bûne yan ji baştir e ku em bibêjin qehweyî bûne, çinkî qehweyî rengê jibîrkirinê ye • Min got: “Lê anîha berf dibare.” • Te got: “Sîwana porê xwe ji bîr nekim?” Min got: “Na..” • Lê wê roja ku ez hatim te bibînim berf dibarı, te cilêñ reş li xwekiribûn, û berçavka reş li ber çavê te sê xuşkên Şexov di destê min de xwê dabûn.” • Te got: “Kê ji wan bêtir?” • Min got: “Nizanim, lê min divya çend peyvîn ku di dilê min de bûne pizot û min dişewitînin ji te re bibêjim.” • Te got: “Çima te negot?” • Min got: “Eger min gotiba te yê ci bersiv bidaba?” • Te got: “Da bibêjim eger alîkariya Şahzadeyî bikim û pizotan derbixim dê Şahzadeyî ci bide min?” • Min got: “Hergav berî em hîzir bikin tişt diqewimin.” • Te got: “Ev ne bersiva min e.” Dengê tirumbêlekê hat • Min cigareya xwe vemi-rand • Heza dîtina hinarka memika te û hilanîna por ji ser memika razayî dilê min dizî • Ez hatim jûreyê • Min çeqmaq vêexist • Memika te diyar nebû • Ez zîvirîm û min çîra vêexist • Tu li wir nebûyî • Min li nivînan nêri • Şûna serê te li ser balgehê mabû • Li ser balgehê û di nav nivînan de li tayekî porê re geriyam • Min nedî • Min serê xwe li cihê serê te li ser balgehê danî • Bîn jê dihat • Bîna te • Dengê xewa te • Porê te • Dayika min • Hilma cilê zindiya • Birîna laşê meytan • Bîna axê • Baranê • Bîna dengê bavê min • Perdeyê • Tirsê • Bîna hewşa pir ji pirtûkên şewitî... • Min cigareyek hilgirt • Min viya çeqmaq vêxim • Dengê tirumbêlekê hat..



## Uzunname – III

### Romaniya romana "TU"-yê

**P**îvanên teorî di avakirin û nirxkirina çanda cîhanî de, şûna xwe bi tundî girtiye. Lewra, her nivîskar gerekî nasîn û pêkanîna van pîvanaan, li gorî dibistanê çandeyî, dibe. Dibistaneñ rexneyî jî, li gorî van pîvanaan, pergallêñ nirxkirina her babetekî çandê hene. Roman jî besê herî gewre ye ji êrîşen rexnegiran re.

Ev jî ji wê hatiye, ku nivîskarê romanê dihingive giştîya jîyanê. Dêmek romanînîs, di çavêñ rexnegêr (xwêner) de lêkolînvanekî civakî ye, dîroknîvîs e, filosof e, hozanekî zanistî ye, yan jî ev kes tev e. Lewra bexşanevan e.

Cî romana hebe, li gorî van dîtinan, li ser sê regezên bingehîn (yên realîst) ava dibe. Ew jî dem, kes û war (cih) in. Lê, kêsimê hunerî û qîlafetê romanê jî rola xwe, di avakirina heyber de, dileyizîn. Piştî nasîn û pêkanîna van tiştan (regezan) pêdiviya nivîsandina romanê û na-veroka wê dimîne. Ew jî ew e, ku xwêner

zaniibe nivîskar ci dixwaze jê re bêje, ci pêş dike, wî ji ci dûr dike û ci behweriyê dîghîne xwêner. Ev tişt jî, di rêya şeweyê nivîskar re xwe diberdine bedena romanê û struktûra avakirina wê diyar dîkin.

Lê mixabin ku çanda kurdî, nemaze besê romanê, ji zanistiyêñ nûdemî dûr e, û ne desthilat e ku karibe xwe nêzîkî banêñ romana cîhanî bike. Wilo jî rexne di vê çerxê de digere. Yek ji sedemên bingehîn ji vê bişûndemayînê ew e, ku kurd di hemî warêñ siyasi, aborî, civakî, mirovanî û rewşenbirî de bişûndemayı ne. Loma jî asoyêñ têgihiştina mirovê Kurd, bi gelempêri, pir nizm e. Vê yekê hiştîye, zirnivîskarêñ Kurd, weku darkê fisê (fîlin, tapo) bi ser avê bikevin û li ser pêlan xwe bihejînin, tanî pêl wan rojekê bi ser rûyê wan de bavêjin ser sêlaka kenêr.

Rexna kurdî jî, iro roj, li dudilîkê rast tê. Ew jî ew e, ku heyberê kurdî nakeve ber pergalêñ ti pîvanaan. Ji ber ku nivîskarê kurd hîna zimanê xwe, ne tenha xweş

nizane, lê pir qels dizane. Belê, nivîskarê kurd (bêgoman ez jî yek ji wan im) hîna di pêkanîna cînavan de şas dibe, di navbera nêr û mî de xilmaş dibe, hevokê rast û durust ava nake û nizane pergalên rastnivîsê pêk bîne, lê nivîskar e!!!.

Ji bo ku em pir dirêj nekin û berê tîrêne we bi ser xwe de rast nekin, emê li nirxkirina romana "Tu" vejerin, û hewl bîdin ku dîtinêne xwe weku xwêner berçav bikin. Nirxkirina me jî wê di warê avakirina romanî de be. Lewra, em xwe pêwîstî berçavkirina regezêne avakirina romanî dibînin.

### **Forma axaftinê di romana "Tu"de**

Gava mirov li bang, gazî û danûstandinê weku parçen axaftinê binêre, mirov pêwîstî nasîna alavêne vê axaftinê dibe. Alavêne, ku kurd di vî warî de pêk tînin, weku pêşdankên bangê (wa, lo, lo-lo, kuro, lê, lê-lê, keçê) têne berçavkirin. Navêne nêr bi pêşdankên (wa, lo, lolo, kuro) ve têne girêdan û di veguhestinê de paşdanka (o) distînin. Navêne mî jî bi pêşdankên (wa, lê, lê-lê, keçê) ve têne girêdan û di veguhestinê de paşdanka (ê) distînin.

Dêmek, pêşdanka "ya" ne di gazî, ne di bang û ne jî di axaftina kurdi de, weku alav, nayêne pêkanîn, û bikaranîna wê dimîne formeke biyanî. Danerê romana "Tu" bi gaziya "ya kêzê" dest bi axaftina xwe dike û tevna kêsime romana xwe bi vê destpêkê dihûnc. Wilo, birê pêşî bi "Tu" ya kêzê tê hûnandin : "tû ji kû derî hatî", "Tu sax bî", "Tu ne dîl î" û gelek "Tu" yên din. Lê, di birê didiwan de gih ev form dibe "tu" ya nivîskar : "Tu û he-

valên te...", gih jî dimîne ya kêzê : "Tu diçî, tu nabînî, tu dê bazdî..." R.33.

Daner di rûpelên 54-55 de vê formê te-xepaş dike û dîse li xwe vedigerîne : "Tu wekî kewroşkeki", "Tu li hember polîsê ku li tajîyan diçû", "Tu li ser zik..." û gelek "Tu" yên din pêk tîne. Lê, nivîskar di rûpelê 61 û de forma bang û gaziye di axaftina xwe dê diguhere, gava ev form bi dapîr û kêza wî re dikeve yek çarçevê. Ji dapîra xwe dipirse : "Tu dê işev jî werî ba min?" û ji kêzbatuna xwe re dibêje : "Tu pê dizanî..." .

Nivîskar tevna heyberê xwe bi vî rengî dineqîşîne, û bi "Tu dizanî" axaftina pismamê xwe, bi xwe re di zîndanê de bi rûpelin pir dirêj (124-130), dixemilîne. Lê, kela nava wî bi vê formê hînik nabe, loma dîse li xwe vedigere û bi xwe re diaxive û dibêje : "Tu ji cihê xwe rabûyî", "Tu çûyi", "Tu hatî...", "Tu rûpela yekemîn qulipand" û gelek "Tu" yên din di rûpelên 131-138 an de pêk tîne. Wilo jî ji bîr nake, ku di rûpelê 187 an de "Tu di valahiyek pir fireh de...", "Tu dîsan... hişyar bûyî" û gelek hevokê (axaftinê) bi vî rengî biafirîne, da bi vê rewaniya bêserûber xwe bîghîne dawiya romanê.

Bi vî şîweyî daner xwe di nav pêlên "Tu" ya kêzê, dapîr, pismam û "Apo" yên xwe de winda dike, û nema zane avjeniyê bike. Loma axaftinêne xwe û qehremânê romana xwe bi cînavê "Tu" ve gi-rê dide, tanî cînavêne "Ez" û "Tu" li ba wî di bin yek pergalê re derbas dibin, û bi yek rolê dirabin. Èdî, mirov dikare cînavê "Ez" bi cînavê "Tu" yan jî kesen şûngîren wan, bi hev biguhere, bê ku şîweyê

avakirina romanê bê guhertin.

Ne tenha wilo, lê daner axaftina qehremân romana xwe bi şêweyekî hevpeyvîniyî xav û qels jî ava dike.

Di rûpelê 41 ê de, gava "Komîsér" û polîsên pê re bi "pihêt" li deriyê daner dixin, daner wan nîv seetê li ber derî dihêle (dem jî zivistan e û şev bi baran e), da dêya xwe bi hatina wan agadar bike û jê re bêje: "Ez behwer im polisin li derî dixin", "Her kesî dibin, ez behwer im, ew dê min jî bibin". "Lê qaxû mekin piştî çend rojan dê min berdin". Li vê axaftinê naraweste, lê jî dêya xwe dixwaze da "hinek van deran bide hev".

Daner hatina polîsan bê şik dihêle, gava "bi tirkî li ser wan qîriya" û bi fermanî dengê xwe gihande wan "De bisekinin, me dengê derî bihîst, ez im têm!...".

Di rûpelê 42 an de bi ser ku daner komîsar bi deng, bi reng û qilafet nas dike, "Lê rast, hûn kê ne?" jî wan dipirse. Hingga, komîsar bêçare dimîne, û xwe bi "Ez ez im", "Ev jî hevalên min in" dide na-sîn.

Bi vê rûdariyê daner nahêle komîsar û polîsên pê re, yên ku piştî "seet 2.43" sibîhê nîv seetê li ber derî di bin baranê de mayî, ji kirasên xwe dernakevin, lê dihêle ku "peyvîna wî (ya komîsar), normal" bimîne, da rê bi gotina "De baş e, ez dê bi we re werim" bide xwe. Qey daner nizâne, yan jî xwe nebihîstî dike, ku avakirina vê hevoka dawî di forma bersivdana lavakirinekê de tê, û bi merbendiyekê ve (şert) tê girêdan!. Wilo jî, bi vê avakirinê, polîsan bihnferêh û mirovan berçav dike. Ji ber ew polîsê serdest (gurên inqi-

laba Everin), ku berê sibîhê bi "pihêt" li deriyê tawankarekî bixe û erkên wî bisermalêdegirtin be, wê axaftina wî ne "normal" be, û wê vê hevpeyvîna dirêj, di bin baranê de, li ber derî, neke. Û wê agadar-kirina tawankar bi gotina "tû pê ne hesiyayî ci guhertin bûne?" R.43 neke barê xwe û pêwistiya wê nabîne.

Daner komîsarê xwe di rûpelê 49 an de diberde nava pirtûkxana xwe û dîwana Lorka dixe nav desten wî, pê dide xwendin û dihêle "we qet li ser ezmên marên zer dîtine?" di rûpelê 50 ì de bêje. Daner vê pirsê ji nav lêvên komîsar derdixe, da rê ji xwe re veke û bi fermanî şîretekê lê bike û bêje "Mîrze komîsér de bes e! Ev çend jî nabe, tu ne mecbûr ï, ku jî bo her tiştekî bipeyivî, baweriya xwe bibêjî". R. 50.

Bi vî rengî daner perda evrayiyê (qudsiyetê) berdide ser axaftinê di malê de û wan "normal" berçav dike. Lê, ku dighe derive ba "jipê" ev perda evrayiyê diqete, loma komîsar yekser fermanê dide polîsên xwe "De zû lê siwar bin, vî segbavî pir wextê me girt". R. 54. Yan jî "segbavî hîn dipeyivi!... Lê bidin... Lêdin". R. 55.

Êdî, bi guneh û bê guneh daner her gav û her kêlî lêdanê dixwe!. Ev şêweyê axaftinê, di rûpelê 92 an de, tê guhertin û bi rengekî hîn xavtir ava dibe, gava daner "Di ser Hakîm de qîriya" û bi "hêrs" jê re got, "Çawan dibe? Çawan tu bêî tu pirs û pirsyarî biryara girtina min didî? Tu henek dikî, ne wisan?". Daner di romana xwe de dibêje, ku gelek zargotinê kurdî kom kiribûn. Lê diyar e ku ya di-bêje (Henek li K. romiyan nabin) ne ni-

vîsiye. Gerek e daner, ew rewşenbîr û siyasiyê kurd xweş zanîba, ku ev ne henek in, lê henek pê kirin in. Loma jî "Hakîm" bersiveke sar dixe destê danerê romana "Tu" de, gava dibêje "Naxêr, rast e. Ji îro û pê de tu girtî yi" R. 93. Lê berxwedan jiyan e. Loma, tawankarê li hember "Hakîm" hewl dide, ku hakimê xwe bi yasayên dewleta Tirkî naskirin bide, gava jê re dibêje "Ev kir û kirdeyên te, li gorî qanûnên we jî şas in". Hakim jî bi xwînsarî lê vedigerîne "Fermo derkeve, bila xwedê bi te re be". r.93.

Danerê romana "Tu" di gerînek û di nav pêlên axaftinê de gêj dibe, tanî xwe di şêweyê axaftinê de – dighîne pêpelû-keke herî nizim, gava pirseke zarokî ji "hevalê kêleka xwe" di zîndanê de dike, "Keko, ev nan çîma wisan hişk e?". R. 131.

Bi vî awayî astengê danûstandinê di romana "Tu" de bê jimar in. Lê daner xwas di ser stirî, xîp û keleman re baz di- de, bê ku êş û janê hest bike.

### Dem di romana "Tu"de

Dema romanî, li gorî pergalên romanni- vîsê, dibe du beş. Beşek bi dema buhûrî ve tê girêdan, ku têbîrên nivîskar in, û xwe di rîya nava wî ve dide der. Beşek jî bi dema niha ve tê girêdan, û bi bûyerên ku dibine bingehêne tevna avakirinê tê pêçan. Ew jî pelandinên derveyî nava wî ne. Dema nivîsandin, xwendin û axaftinê jî dibe parek ji vî beşî, û li ser dema romanê tê hesabkirin.

Lê, nivîskarê me dema avakirina romana "Tu" ne bi huşyarî, li serpêhatî, têbîr

û bûyerên romanê belav dike. Loma di navbera dema buhûrî û ya niha de tar û mar dibe. Êdî dema real û ya monoloj li ba wî nayêñ sînorkirin. Wilo jî ne guh dide nivîsandinê, ne ya xwendinê û ne jî ya axaftinê. Loma, ne tenha xwe tar û mar dike, lê xwêner jî bi xwe re şas dike, tanî dema xwendina romanê li ba wî ve- dizîle û dirêj dibe. Nivîskarê romana "Tu", di rûpelê 39 an de, demeke kenar- kirî dide dest xwêner. Belê, "Dema derî- yê we yê derva pihet lêket... saet 2.43 bû". Lê mixabin, ku daner nikare vê de- ma xwe bi bûyerên romanê re çareser bi- ke, gava 16 rûpelan bi xumandina polîsan li malê didagire bê ku li wan bibe sibeh. Wilo, demê jî ba xwe dirawestîne, bûyerê real divezîlinê û qul qewêrên malê tevan bi polîsan re xum dike. Ne tenha wilo, lê bi wan re dikeve guftûgoyêñ jar û pûç de, da bi xwêner bide zanîn ku "Rilke, Conrad, Joyce, Tolstoy, Dickens, Mann, Kavawîs, Lawrence, Faulkner, Gary, Hayyam, Derwîş, Woolf û yê din..." govend li pirtûkxana wî girêdabûn. Êdî, vê dema vezîlandî, ne ji xwe re, ne jî ji xwêner re dike problêm. Lê dîse baş e ku navên nivîskarêne li pirtûkxana Melekî ya Stockholmê tev nenivîsin!.

Li vê yekê jî naraweste, lê "Komîsîr" dixe nav pirtûkan û dihêle yek bi yek ra- hêje wan û pel bi pel wan biqulipîne. Di- lê nivîskarê me wilo jî hînik nabe, tanî dihêle ku "Mîrza komîsar" pirtûkeke "Lorca" bixwîne û "Rêzên şîirê ji hev..." bixwîne. Wilo jî "Çexov" dixe nav destê mîrzayê xwe de, da wî li ser "nîzama bol- şevîkî ..." û "serekê sor Lenîn..." biaxivî-

ne. Nivîskarê me, bi vê xwînsariyê, resmê li demê dixe û wê gem dike, da xwe bi armanca xwe bighîne, da helbesteke "bi destnivîsa..." kurdî di nav destên komîsêr xîne û kêfa wî li xwe bîne, da çarê ji negirtina xwe re nehêle. Lê, bi dilaramî doza komîsêr bi xwendina vê helbestê bi cih nayîne, û "tika dikim, niha ne wexta van tiştan e" lê vedigerîne. Ëdî, piştî axaftineke dûdirêj bi dê, xwîşk û birayêن xwe re, dema bûyer bi ferma xwe çareser dike, gava ji polîsan re dibêje "Fermo em herin". Bi ser vê tevî de hîna dem dimîne "şeva tarî û bêkes", lê dêya wî ji bîr nake di vê şeva bi baran de "wê ava satila ku di destan de bû li pey" birijîne!!!.

Nivîskarê me, di rûpelê III an de, xwe û bûyerên romanê ji terz û endazên ke-narkirina dema girtîxanê azad dike. Wilo, ew û pismamê xwe "Li dora masê he-ta saet 23.30 ê şevê rûniştin, paşê rabûn". Lê ne rabûn da bikevin xewê de!. Belê, rabû da 8 rûpelan ji romana xwe bi lebt, ger û tevgera xwe di zîndanê de dagire, bê ku guh bide pergalên pêkanîna demê di avakirina heyber de, bê ku yasayêن girtîxanê di sînorkirina dema bûyerê de rola xwe bileyize. Wilo ji, bê ku guh bide dema nivîsandin û xwendinê.

Bi vî awayî, ew û pismamê xwe gereke zîndannasîn dîkin û "ji qoxîşa divemîn dest pê" dîkin. Pismamê wî "qoxışan" û fesal û awayê jiyanê di wan de, "avdestxanê" û jimara parçen wê, "cihê xwe şûstînê" û awayê xweşûstinê, cihê "Kinc"şûstînê û pergalên Kincşûstinê, "aşxanê" û pergalên kar û xwarinê tê de, û dawî "be-xçê" girtîxanê ji mihvanê xwe re pesin di-

de, da pişt re wî bibe ser textê xwe û "pîjamên" xwe, "destmalê", "derpî", "kirâs" û "şimikan" jî dide wî û berê wî bi şûn de dide, da here xwe bişo. Mihvan jî (girtiyê nû, nivîskarê romanê) nemerdî nake û berê xwe dide "avdestxanê". Li wir dirûne û "avdesta xwe" dike. Pişt re diçe, xwe û kincen xwe dişo. Wilo, dema bû-yerê diraweste, lê ev bûyera real berde-wam dibe, da ji nû ve girtiyê me (daner) vegere ber sobê û xwe ziwa bike!. Li wir demeke dirêj dirûne û silavêن girtiyân vedigerîne. Piştî vê tevî bûyer berdewan dike, da du polîsên nobedar û sê kesen girtî bike dost û heval û wan li dora soba "aşxanê" bide rûnandin, û wilo jî yekî girtî bîne şebuhêrka xwe, da bikevin gif-tûgoyêن jiyanî de. Bi vî rengî, dem bê rol û bê çare dimîne, lê bûyer bi gotina "li min bibore, xewa min têt..." nema berde-wam dibe!!.

Ev bûyer bi demeke real ve tê girêdan, ne bi dema monolojê ve. Dêmek, li gorî vê avakirinê, gerek e roj li qehremanê romanê (daner) derkeve, eger roj ji çerxa xwe dernekertibe!. Bi vî rengî jî peyva "zîndanê" bê wate dimîne û avakirina bûyerê, di romanê de, bê sûd xwe belû dike.

Mirov dikare bê fedîbûn bêje, ku têbî-rênen nivîskarê me, di romanê de, aso û banê têgihiştinêñ wî berçav dîkin. Ew têgihiştinêñ ku dem rola xwe di avakirina wan de naleyize. Loma roman, di gelek waran de, xwe ji avakirineke realizmî ber fantaziyê ve dikşîne. Qehremanê romana "Tu" (daner) zaroktiya xwe, di rûpelên 60-61 ê de, bi bîra xwe tîne, û wan xew-

nên ku di wan de "misas, şûr, mertal, tîr û kevanê "xwe" li ser pişta hespê" xwe "yê merd" dikirin, tîne ber çavêن xwe, da bi-keve "nav koma cinawir, pîrhevok, şeytan û fêsedan" û bêje ku "Min zora wan dibir,..., û ew ji welatê xwe dûr dixistin".

Bi vî rengî ne tenha rol ji dema real re namîne, lê roman bi şêweyekî fantazî xwe ber bi avakirineke çewt de dikşîne. Wilo, dem di formûlekirina WELËT û pîrhevokan de, li ba daner, dibe yek. Ge-lo, zaroka ku şer bi "Cinawiran re bike", "welatê" xwe di ci çarçeva têgihiştinê de dinase?. Erê, têgihiştina wata bêjeya "WELAT" bi pêşketina demê ve tê gitêdan. Ew pêşketina ku zarokê ji warê ne-bîreweriyê diguhêze warê bîreweriyê. Dêmek, gerek e dem wê zarokê mezin bike da "welat" şûna xwe di hişê wê de bi wata xwe ya durust bistîne. Eger zarok, di demê de zarok bimîne, bila welatê wê jî mala wê, gundê wê, tara wê bimîne. Hinga dem şûna xwe bi rewanî di heyber de digre û rîsê tevna avakirina romanê rast û çê tê hûnandin.

Daner "Apo" yê xwe, weku qehremane-kî romanê, jîr, zane û bêhempa berçav dike. Wî di sala 1972 an de (sala zîndankirina daner) 70 ê salî dide nasîn (di 1. 145 de jî 73 ê salî ye). Rengê vê avakirinê, ci demane be, ci kesane be, di romanê de rewşike normal distîne, gava di mercen avakirineke durust de bimeşe. Lê, mixabîn ku nivîskarê me, di rûpelê 139 an de dema serpêhatiya xwe (1972) tevlî dema têbîran dike, û di vê şâsiyê de kirasekî bê bestik li têgihiştinê xwe yên civakî, siyasi û dîrokî dike. Belê, ne bêbextiyê bi

xwe dike, lê bi pepûkî xwe diberde nava demê. Ji ber da "Apo" yê xwe di çav xwêner de nirxdar û bîrkêş bide pêş, dihêle ku "wî 50 sal bi dewleta Tirkî re şer kiriye" ji "Apo" re bibe ala kurdewariyê, bibe nişana têgihiştin û mafnasiya mirovan. Wilo, daner "Apo" yê xwe bi xama xwe, ne bi hişê xwe, ava dike, tanî xwe di gerîneka dema avakirina romanê de wer dike, û tê de sergom diçe.

Belê, salbûna "Apo" di demeke normal de dibe 1902 (sala 1972 temenê wî 70 sal bû). Lê, daner li vê yekê naraweste, gava jiyana xwe û ya "Apo" di demeke dîrokî de, bi hevoka "50 sal... şer kiriye" kenar dike. Edî, eger "Apo" bi zîkmakî jî ketibe şer de, salbûna wî dibe 1882 (ji ber serhildana Agri – 1932 – di dema "Apo" de ya dawî bû) [Serhildanê Sasûsnê, Dêsimê jî xwe gihadine salên 1936 û 1937an]. Li gorî vê pîvanê, salbûna daner jî ne 1953 dimîne, lê dibe 1933 (ji ber ku "Apo" bi 51 salê ji daner mezintire). Dêmek, nivîskarê romana "Tu", berî bê dinê bi bîst salan girtiyê zîndanê bû!. Ev rengê bêser-rûberiya demê di romanê de, eger ne bi gêlîti û xepebûna daner ve girêdayî be, ji fantazyâ jî derbas dibe!!.

### Kes di romana "Tu" de

Kesên ku daner heyberê romana "Tu" bi wan dihûne pir in. Rolên wan di avakirina romanê de cuda ne, û erkên wan jî di lêkirina bûyeran de başqe ne. Wilo, qehremanê romana "Tu" gel, girtiyêñ girtîxanê, desthilatêñ Mîriya Tirkî, daner û kêzbatûnê ne. Ew jî li du celeban par ve dibin. Celebek bindest e, lê di dîtinêñ

daner de, berxwedanê dike û roleke posîtîv di avakirina heyber de dileyize. Yek jî serdeste rola negatîv bi xwe digre. Daner jî, li gorî jîrbûn û zanebûna xwe, wan bi lebt û tevger dike, û heyberê xwe bi dîtin û livandina wan ava dike û hewl dide ku vê avakirinê bi pergalên romanî bi kiraz bike. Lê, tanî çi pileyê xwe bi armanca xwe dîghîne, dimîne ji behweriyêñ xwêner re. Me jî di vî warî de, weku xwêner-rekî, nerînek heye. Nerîna me jî bi kurtî ew e, ku daner bi dev û lêvên xwe qehremânê romanê ava dike, û rola demê di vê avakirinê de nahêle. Loma qehremânê romanê di bin yek pileya têgihiştinê re derbas dibin. Erê nav pir in, lê zîlan her dimêne kesek. Ew jî daner e. Ji bo em vê nerîna xwe jî bi rewani raxin, emê axaftineke rû li rû bi kesen romana "Tu" re vekin.

## Daner

Daner di rêya bûyer û serpêhatiyêñ xwe re, di rêya dîtin û têgihiştinêñ xwe re û di rêya behwerî û ramanêñ xwe re dibe zîlana berhemê xwe. Loma, rola kesê zîlanger, di romana "Tu" de bi xwe digre. Wilo, xwe dike padîşah, û qehremânê romanê ji xwe re dike navmalî. Edî xwe desthilat dibîne, ku wan li gorî bîr û behweriyêñ xwe bilivîne, li gorî dîtin û têgihiştinêñ xwe biaxifîne û li gorî asoyêñ hiş û ramanêñ xwe bi lebt, tevger û pîş bike. Belê, Kurdan gotiye : "Etar ji xurcika xwe xeber dide". Vêce gelo, çi di xurcika M. Uzun de heye, ku ji xwêneran re, li ser mafûra romana "Tu", diraxe?. Bersiva vê pirsê jî bi giştîya lêkolînê re belû dibe.

Bo vê yekê jî gerek e em şevekê li civata romana "Tu" rûnin û kesen wê jî ji nêzîk ve nas bikin. Nivîskarê me, berî her kesî, qehremanê bêhempa ye di romana xwe de, û kesen romanê wek alavêñ dûmahiya xwe li dora xwe dicivîne. Wilo, daner di rêya têbiran re dergehê romana "Tu" ji Kêzbatûna xwe re vedike, da xwênerê xwe bi şêweyê avakirina romanê serwext bike.

M. Uzun xwênerê xwe bi çewtiyeke gewre di derheqê folklorê kurdî de serwext dike, gava di rûpelê heştan de (8) kêzbatûna xwe bi "Heywaneke bi xof, gemarî û xirab" pesin dike. Belê, qey daner nizane, yan jî hest nake, ku (Kêza Kêzbatûn, xwedyâ şimka reqreqûn, xwedyâ şara pitpitûn, xwedyâ krasê geretûn...) di vî pesnê folklorî de, bi xeml û spehîtaya xwe navdar e, û ne tenha di çav zarokan de, lê wilo jî di çav mezinan de xweşik, paqîj û dilovan ell!

Xatûna kêzikân jî, di folklorê kurdî de, kêzika zérîn e. Ev kêzik pir xweşik û paqîj e (perên wê qesebok in û warê wê dârika Tehliyê ye), loma bi zarokê şejinx-weiş e. Dilovaniya wê jî ji mijûliya zarokê pê re hatiye gava wê li ser pişte dideyne û bi teptipandin (Kêzka zérîn qoplanî moplanî...) bi awazekî şérîn jê re dibêje û doza xwequlipandinê lê dike. Hinga kêzê perên zérîn vedike û xwe di ser serê xwe re gêr dike. Loma "Kêzbatûn" ê di hisê zarokê de wêneyekî pir delal dimîne.

M. Uzun ji derdêñ işkencê û tenhabûna li zîndanê dixwaze kul û êşen xwe ji hevalbendekî re bêje. Loma "kêzikeke bîçük û reş" R.218 dike hevalzîndana xwe.

Lê, di zîndanê de jî vê hevalê cêrî dibîne, gava "quesra" wê dibe ew "dembolê mîzê" yê ku "ji bîhnê firnikên bîvila (daner) xetimî" R. 36.

Wilo, daner xwe desthilat dibîne, ku hevalzîndana xwe di zîndanê de bixe zîndanê. Erê, daner dibe (qelsê bi ser de ketî), gava bi ser dîlîtiya xwe de û di cihê dîlîtiyê de moreke bêguneh dike dîla xwe. Ma ka mirovaniya ji vê payebilindir?!!

## Kêzê

Çawa be, kêzê dimîne ew mora ku avakirina hunerî ya romana "Tu" pê ve tê girêdan û, bi daner re, dibe hevalpişka zîlana romanê, gava dibe alava wî di hûnan-dina monolojê de. Lê, ev kêza dîl, ya ku di "dembolê mîzê" de hatî zîndankirin, dijraberiyekê beloq dixe wê avakirina hunerî de. Wilo, çîka huner bi vê avakirinê divemire û tox û sar dibe, ji ber ku monoloj li ba her mirovekî wilo jî li ba her danerekî, ew axaftina dûrî akamên pêlê-kirin û perçiqandina serdestiyê ye, loma bi rola axaftina herî serbest û serfiraz di-rabe, û dibe neynika hemî dîtin û beh-weriyên ku bê tirs û kontrol têne raxistin.

Gelo, ji wê girantir heye, ku mirov di nava xwe de vemirî be, ku çîkek germî di nav wê tirafa nava mirov de ne mabe?!. Anglo, mirov bi xwebîr û behweriyên xwe bixe rika (rekih) dîlîtiyê û derî li wan da-de. Ne tenha wilo, lê bi ser de jî, pesnê xwedîlkirinê bide?!

Bi vî rengî nivîskarê romana "Tu" ne tenha weku kes (gewd) di warê beolojî de dîl dikeve, lê weku can jî (monoloj – kê-

zê) xwe bi qeyd û bendên dîlîtiyê girêdi-de, gava bi vî şêweyî rola "Kêzê" di avakirina hunerî ya romanê de çareser dike. Li vir pirsek tê meydanê. Ew jî ewe, ku bê hebûna vê hevalpişka daner di zîlana heyber de, wê çawa roman, bi vî şêweyî, hatiba avakirin?. Bersiv jî pir asane. Lê, emê bersiva xwe di deryê ramanê romana "Tu" de berçav bikin.

## Apo

M. Uzun rola wî kesê di xebat, bûyer û serpêhatiyêن dîrokê de piçpiçî dispêre "Apo" yê xwe. Loma, wî weku kesekî bîrkêş, nirxdar, cengbaz û şehlewend ava dike. Erê, nivîskar qehremanê romanê bi xama xwe ava dike. Lê, gelo xwêner jî vî qehremanî weku daner dibîne?.

Da em geleki dûr neçin, û di nav rê û şivîlkêñ mêtûyê de, di nav wan rûpelên zer û kevnar de xwe winda nekin, emê xwe û we hinekî vehesînin.

Dibêjin, piştî keşayê dêra gundekî sîr-yanî kal bû, yekî xort kete şûna wî de. Bi hatina keşayê xort re, gundiyan hin bi hin xwe ji dêrê vedan. Keşayê nû gilihê xwe bi vê rewşê gihande ber desten yê kal. Kalo jî şîret li xorto kir û got :

— Tu gundiyan agadar bike, ku yeksema bê wê keşayê kevn wa'zan bike. Ezê di wa'zêñ xwe de, te bi wan şérîn bikim, paşê gotinê bidim te. Lê, tu jî gulpekê vexwe, da bê fedî tu wa'zêñ xwe bikî.

Yekşem hat. Xorto bi ya kalo kir, lê ji gulpekê derbas kir. Wilo, piştî wa'zêñ xwe qedandin, limêja xwe kirin û ji hev bela bûn, keşayê xort ji yê kal pîrsî :

— Wa'zêñ min çawa bûn?.

— Pir xweş te got. Ma te nedît, çawa dêra li devdevka mişt limêja xwe bi kêt û şahî kirin.

— Ti şasî bi min re derbas nebûn?.

— Hebûn lê ne yên gotinê ne.

— Çi bûn?... Da ez di pêş de wan ve negerînim.

— Tenha sê şasyiyêن bicûk bûn.

— Çi bûn?

— Ya pêşî, xwedê Îsayê Nûranî li Bêt Lehim daye, ne li Bêt Mirî[Navê gundê keşayê xort e], weku te gotî. Ya didiwa, Îsayê Nûranî kurê Mêrema Bêguneh e, ne kurê dêlika Mêremê ye, weku te gotî. Ya sisiya jî, Îsayê Nûranî gotiye werin ba min, da ez gunhêne we xîş bikin, ne yê neyê ba min ezê di dêya wan...m, weku te gotî.

Şasyiyêن daner jî, di avakirina "Apo" yê wî de, ne yên gotinê ne, pir bicûk in. Ji ber ku:

i. "Apo" "Qet tirkî nizane" R.122, lê ew e "Kesê ku cara yekemîn li Tirkîye el-faba kurdî nivîsand... R. 122".

Emê vê şasyiya bicûk bi du pirsan bisi-périn xwêner. Ya pêşî :

— Gelo, ev qehremanê di dîroka kurdî siyasî û wêjeyî de navdar kî ye, ku sala 1972 an bi M. Uzun re hatî zîndankirin?!.

Pirsa din jî:

— Gelo, mirovê ti zimanên cîhanî, û wilo jî yê mîriya xwe bi xwendin û nivî-sandin nîzanibe, çawa bi vê gêlîtiya xwe dikare "elfaba" ya zimanekî deyne?!

2. "Apo", ev rewşenbîrê gewre, di rêya M. Uzun re (weku wergêr) giftûgoyê bi "Sosyologê Tirk" re vedike û ji wergêrê xwe re dibêje "Ez tiştê Mamoste dibêje

baş fam nakim. Lê, Mamoste herçî dibê-je rast e". R.159.

Ev behwerîpêanîna bi koranî (ji ber ku "Apo" ne zimanê "sosyoloj" dizane, ne jî berhemên wî bi ti zimanên din xwendine) nîşana ci ye li ba daner?! Li ba daner nîşana ci be, li ba xwêner dimîne ya gêlîti û saltgîrîyê.

3. Ev "Apo" yê ku "so sal bi dewleta Tirkîye re şer kiriye" bi dilpakîke bê sî-nor dibêje "Kumandar", "Lawo, xortêne me berdin û ci cezayênen wan hene, hemû-yan bidin min". R.146.

Ma ev peyva xav û kelê gerek e ji devê cengbaz û rewşenbîrekî weku "Apo" yê daner derkeve, eger ev axaftin ne ya da-ner be, ku bi dev û lêvên qehremanên ro-mana xwe xeber dide?!!

Bi vî rengî "Apo" dibe ne ew kesê ku di demê de siqa bûyî, ne ew kesê ku demê ew ava kirî, lê dimîne ew qehremanê ku xama romannivîs, li gorî asoyêñ dîtin û têghiştinên xwe, ava kirî. Edî "Apo" na-be bîrkêş, rewşenbîr û zîrekê gelê xwe, lê van pesnan tenha di çav nivîskar de distî-ne.

## Sosyolog

M.Uzun civata qehremanên romana xwe bi anîna "sosyolog" ekî tirk xweş dike, da wî jî di çavên xwêner de bicûk diyar bi-ke. Edî, daner dibe serek û serkêşê vê ci-vatê, û nema kesî tîne qama xwe. Leto [Letoyê şêxoyê Nado, mitirb û komîkekî bi nav û deng bû; li herêma Cezîrê, li Tirbespiyê dirûniş] digot: bereketa her tiştî di destê Xwedê de ye, lê ya dêw di destê dêya min de ye.

Belê, ci ne di destêن daner de be, rol û pesnêن kesêن romanê di destêن daner de ne. Û di nav lepêن wî de weku guloka hevîr in. Bixwaze wan pan dike, dirêj dike, hişk dike, nerm dike. Bixwaze wan dike nan, dike nanik, dike kulorik. Bixwaze wan dipije, wan xav dihêle, wan dike pato. Bixwaze jî şor dike, kelê dihêle, bê tam dike. Lê çawa bin, dimînin nanê mewlida romana "Tu", û di tenûra danevê wê de têne çêkirin.

Çilo, pepûkê "Sosyolog" ê tirk bûye piçek ji guloka hevîrê daner, êdî ev bextreşîya wî ye!

Belê, bextreşîya wî ye, gava M. Uzun wî bivênevê dike, ku ji ser cihê xwe rabe û here "du dosiyên stûr..." R. 159 di bin çengê xwe de bîne, da behweriyên daner bi gotinêن xwe, di pirsa kurdî de bîne.

Sosyologê tirk bi vê neçariyê "dosiya yekemîn" diqulipîne, da "statistikê" bi xêr û bêra Kurdistanê ve girêdayî pêş daner bike û jê re bêje "welatê we dewlemend e, lê bindest e". R.160.

Wilo, M. Uzun dihêle ku ev "Sosyologê tirk", yê ku ji ber nivîsandinêن xwe, yên li ser pirsa kurdî, hatî girtin, pirtûkxana xwe (di nav de jî ew lêkolînêن li ser pirsa kurdî) ji unîversitê biguhêze girtîxanê. Li gor vê pîvanê, polisan pirtûkêن daner jî ne "dîl kirin", lê "di nav çarşafa sipî de". R. 51 ji pirtûkxana malê guhestin pirtûkxana girtîxanê!!

Hemberî avakirineke kesane bi vî rengî mirov lal dimîne, û tenha dikare di dilê xwe de bêje, ku ev zîndanêن Tirkstanêne, ne yên Stockholmê ne, da yê girtî desthilat be ku nivîsandinêن xwe, yên li

ser wan hatî tawankirin, bi xwe re biguhêze pirtûkxana xwe di girtîxanê de!!

Daner bi vî awayê nedurust kesêن romana xwe li gorî asoyêن têgihiştinêن xwe ava dike. Loma ev "Sosyologê" jîr, zanyar û rewşenbirê gewre jî, di çavêن xwêner de, pepûk dimîne.

### Pismam

Daner pêvî van kesan, di girtîxanê de, "Pismarmê" xwe jî dike alavek, da bibe kopale wî û xwe di rojêن pêşî de bispêre ser. Wilo, bi "pismamê" xwe zîndanê xum dike, girtiyan nas dike, û pêwîstiyêن xwe jî çek, text, pêniyîs û defteran pêk tîne, bê ku ti rolêن din bispêre vî kesê ku ew jî di ber pirsa kurdî de hatye zîndanîkirin.

### Rola civakê di avakirina romana "Tu"de

Bi ser ku me ev sernav daniye jî, lê ne şûngirtiye. Ya rast ew e, rola daner di avakirina civaka kurdî de!!! Ev seyrnîşan jî hatine danîn, ji ber ku daner kirasekî bê bestik li civaka kurdî dike, gava vê civakê weku dixwaze dihêrivîne, weku di hişê xwe de li hev tîne berçav dike û li gorî fantaziya xwe ava dike. Daner di rûpelê 13 an de dibêje, ku "Rûniştevanêن bajêr hemû xwedî rezekî bûn" û "Her rez ji hezar an du hezar mîewan pêk dihat". Bajar çiqasî biçûk be jî, li gorî normên şarvaniyê deh hezar (10 000) mal vedihe-wîne. Eger serê malê (li bajarê M. Uzun) hezar û pêncsed mîew di zik hev de hebîn, mîewan bajarvaniyêن daner dibine pazdeh milyon (15 000 000) mîew. Eger

hezar mîw jî di her hektarekî de hebe, erda bi rez dibe pazdeh hezar (15 000) hektar. Ma nivîskarê me dikare vê panavê bîne ber çavêن xwe, û di hişê xwe de sînor bike?! Ne tenha wilo, lê bajarê ku tenha bi werzvaniyê mijûl bibe, êdî ne bajar e. Dêmek ev civaka ku bi ti kardestan ji werzvaniyê pê ve nizane civakeke gêl û kewden e (ji ber fabrikên çêkirina şîraniyêن ji tirî jî, weku daner dibêje "beros in") !!! Ma civaka kurdî, bi kêmanî di bajaran de, ji dil wilo ye?! Eger wilo be, çawa nivîskarê me yê nozdeh salî, yê hîna xwendevanê lîsê, eger ne yê sinifekî kêm-tir be, karîbû "Rilke, Conrad, Joyce, Tolstoy, Dickens, Mann, Kavawîs, Lawrence, Faulkner, Gary, Heyyam, Derwîş, Woolf û yên din...R. 49", wilo jî "Dostoyevskî, Hamîngway, Nerûda, Sarter, Lorka, Arif û yên din...R. 54.". Li xwe vehewîne? Ma buhar bi gulekê çê dibe, da M. Uzun xwe bi tehna xwe, bike gula bajarekî!?

Daner li vê berçavkirina civaka xwe na raweste, lê bi carekê re wê ji terz û endazên civaka kurdî derdixe, gava dibêje ku "rîsipyen bajêr" li "qehwexanêن xwe" "qehwa" "tahl" divexwarin û "xweş bi domîne dilîstin" û "hostayêن şetrencê bûn", tanî xwe dighîne "rîsipyen bajêr dîsan bi ayet û hedîsan zarok diloran-din". R. 16.

Eger mijûliyêن rîsipyen civaka kurdî werzvanî ne damê, çêlê, nihberk, çarberk û sêberk jî bin, lê hewre ez nebehwerim, ku ji nivîskarê romana "Tu" pê ve kesek di civaka kurdî de vî erkê razandina zaro-kan bispêre rîsipyen Kurdan, nemaze lo-

randina zarokan bi ayet û hedîsan!!!

Daner dihingive civaka gundî jî, gava nûnerê vê civakê, li gorî pesnê wî, ew mirovê "Rûyê wî tijî, simbêlên wî gir. R. 88" di "cemsê" de bi xwe re dike rîwî û dihêle ku ew kesê "wekî dêweki" welatê xwe di lepê xwe de veşêre. Dibêje ku "Di kefa destê xwe yê çepê de bi kurdî û bi tî-pên mezin Welat nivîsibû" R. 88.

Hemî dîroknivîsên ku hingivîne welatê Kurdan û pirsa kurdî, vî mileti bi merdî, mîrxaî, cegerdarî û mîraniyê pesin di-din. Lê gelo tiştê di mista destê çepê de be, ne nîşana veşartin, bêziravî û tirsê ye, ne nîşana dudîlî û bêhêvitîyê ye, nemaze ku dest yê "dêweki" be?!

Kurdan ticarî ne xwe ji ber welatê xwe veşartine, ne jî welatê xwe ji ber xwe veşartine. Lewra kurd bi wê nas in, ku tiştê di dilê wan de be li ser zimanê wan e. Anglo, kurd di behweriyêن xwe de, ne tenha bi ceger in, lê deqerû ne jî. Wilo, gava welatê kurdan li ser pişa destê rastê tê nivîsandin, dibe nîşana xweeskerekirineke dûrî tirsê. Vêce, çîma ev dêwê kurd welatê xwe vedîşere?!

Ma rev û xweveşartin ne biramak in?. Dêmek, danerê romana "Tu" vî nûnerî di xwe re dibîne, û wî weku psîkolojiya xwe ava dike, ne weku heyîna civaka kurdî, da êdî desthilat be ku ne tenha zimanê kurdî bêkêr bike, lê wilo jî mirovê kurd di nava wî de bihêrivîne. Eger ev yeka ji nezanî be jî, ji xwe kurdan gotiye: yê nezan ji yê zalim xirabtir e...

M. Uzun ne tenha civaka kurdî di dema xwe de bi vî pesnî berçav dike, lê li civaka kurdî kevnar jî, di rîya têbîrên

xwe re, vedigere, da serpêhatiya Mîr Miheme û Mîrê Amedê (bi ser ku me di dîrokê de nexwendiye ku rokê ji rojan Mîrê Amedê hebûn), bi dîtinê xwe, şirove dike.

Di rûpelê 141 ê de dibêje, ku "Mîr Miheme mirovekî hêja û gelperwer bû". Du nêriyên pezkoviyan dilovanî xwe dîtibûn, û "bîst salan" di çiyayê Botan de, ji tov re, xwedî kiribûn. Lê rojekê neçarî kuştina wan dibe, da stirihêن wan ji Mîrê Amedê re rêke. Da pê bide nasîn, ku pezkoviyên çiyayê Botan ji yên çiyayê Amedê mezintir û hêjatir in. Belê, qayış û berberiya mîranî, bi vê xavî û saltgiriya xwe, dibe sedema gorîkirina herdû nêriyên delal û dilovan, herdû nêriyên tov.

M. Uzun, hemberî vê mirovaniya kêm û qels, "Mîr Miheme" yê xwe dike "Miheme beg" ê. Li vê yekê jî naraweste, gava piştî rûpelekî nîşana Mîrîtiyê li Mîr vedigerîne, lê navê wî diguhere û dike "Mihemed".

Bi vê asanîbûnê bi nav û nîşanên navdarêن civaka kurdî kevnar dileyize û wan di şerê beranî de berçav dike!. Wilo, nîşana Mîranî ji "Mîr Miheme" dike, û wî "beg" ê rût û tazî dihêle! Bi rastî, gerek e daner ew ji begîti jî daxistiba, ji ber dilovanîya cinawiran pê re qels bû!. M. Uzun çi dixwaze bi vê bûyera dirêj bêje?!. Eger nêrî (ew bi xwe dibêje "Nêriyên tov") nîşana dolvedanê bin, dêmek bi kuştina nêriyan dola qenc li çiyayê Kurdistanê hate birîn. Ma M. Uzun dixwaze doleke baş ji Ewropa li Kurdistanê vegevêrîne!.. Yan jî ji xwênerê xwe re dibêje ku kurd bi destêن payebilindên xwe (Mîr

Miheme) mane bê dol û di pêşerojên dîrokê de wê qir bibin!!.

Wilo, M. Uzun civaka kurdî, di dîroka kevn û nû de bi şêweyekî pasiv û bê hêvî diyar dike. Lewra, rola vê civakê di avakirina romana "Tu" de dimîne roleke jar, pepûk û bêkêr.

### **War (cih) di romana "Tu"de**

War di romana "Tu" de rola xwe bi ferehî dileyize, lê mixabin ku bi çewtî di tevna heyber de berçav dibe. Wilo, war di romanê de mal e, gund e, bajar e, zîndan e, "dembolê mîzê" ye û mista "dêwekî" kurd e.

Warê avakirina heyber, ji dîtina pêşî, welat e, bi ferehî û dirêjaya xwe ve. Zîndan jî parçek ji vî welatî ye, lê nîşana serdestî û dîlkirinê ye.

Vêce, gelo çîma daner ev war bi çewtî di romanê de ava kiriye?. Da em vî berî jî pir dirêj nekin û nivîsandina romanê dubare nekin, emê nîşanên vê panahiyê, li gorî şirovekirinê daner berçav bikin:

i. Daner hewl nade ku ji warê dîlîtiyê (zîndanê) xwe bikşîne warê serfiraziyê (welat), gava ji cihê işkencê li girtîxanê vedigere û dibêje, ku "Pismam, mamoste û hevalên din yên girtî li dora te civiyanbûn". R. 220. Ëdî daner ne tenha xwe, lê qehremanên romana xwe tevan dispêre wê zîndana teng, bê ku hêviyên berxwedanê pê re bimînin gava dibêje "Te bi ken û girî serê xwe danî ser sînga Apo û tu wisan mayî..." R. 220.

Wilo, welatê daner bi wê panaya xwe ve biçûk dibe, tanî dibe zîndan. Di wê zîndanê de jî serê xwe (organê hiş û ra-

manê) dispêre sînga wî kalê 70 salê (dîroka kevn) da bê kefteleft qîma xwe bi dîlitîyê bîne.

2. Welatê kêzê ji, bi wê mezinaya xwe dibe "dembolê mîzê". Dêmek war (cih) li kêzê ji biçûk dibe. Wilo daner ji ba xwîşika xwe (kêzê) derdikeve, lê wê di taristaniya zîndana di zîndanê de (di "dembolê mîzê") bê ser û şop dihêle. Wilo, daner, bi vê reşbîniyê, war li ba xwe hin bi hin biçûk dike, tanî :

3. Welat, weku war şûna xwe di mista destê "dêweki" kurd de dibîne!. Erê dêw ji hêlekê ve nîşana hêz, xurtî û mîraniyê ye, lê ji hêleke din ve ji nîşana nezanî, kewdenî û gêlîtiyê ye. Wilo, daner welatê xwe dispêre mista destê vî dewî, û xwe pêre dispêre reşbîniyeke bê sînor. Bê çawa daner kêzxitâna folklorî bi wê spêhîtaya wê ve bi "Kêzikeke biçûk û reş" di guhere, wilo ji welatê xwe bi spehîtaya wî ve bi zîndaneke bê hêvî di guhere.

## Ramanên romana "Tu"

Armanca nivîskar ji berhemên wî ew e, da berê xwêner bide tiştekî ku nabîne, da behweriyêن xwe bighîne wan kesen ku wî nanasin, da tozikê ji ser wan durêne temirandî vemale û bi behrîna wan xwêne-re xwe agadar bike. Ev dîtinêن daner di rîya heyber re têne berçavkirin, ci ev heyber ristane be, ci ji bexşane be. Berçavkirina wan ji bi şêweyê nivîskar ve, di avakirina heyber de, tê girêdan, ku rastûrê, yan ji veşartî dighîne xwêner. Ci bi tengê komidî be, trajidî be, yan ji dramî û yên din be. Armanca wî, dawî dimîne, şavbelkirina xwêner li tiştekî ku bûye balkê-

şiya daner.

Roman ji, di vî warî de desthilat e ku berekî fereh bide ber xwe, eger romanni-vîs bi xwe serdestî avakirina romana xwe be û karibe behwerî û dîtinêن xwe bi riştî ji xwêner re raxe.

Di vê çarçevê de, emê hewl bidin ku hin romanên danerê romana "Tu", li gorî dîtinêن xwe, berçav bikin û bi kurtî li ser wan rawestin. Daner fermanê dide wê kêzika "biçûk û reş" ku "xwe neêşîne. Ne xwe biêşîne, ne ji min. Li vir, wekî xatûneke malan, li nik min bisikine. Xatûna zîndana min be..., li vir, li ba kekê xwe bimîne." R. 33.

Ev xwîşk û biratiya kêzê û daner dosta-niya Quling û Rovî tîne bîra mirov, biratiya kurd û serdestên wan, ji Tirk, Faris û Ereban tîne bala mirov. Belê, rola polîsên Tirk di zîndankirina daner de weku rola daner e di zîndankirina Kêzê de. Dêmek, li vir serdest û bindest belû dibin, êdî birati li ku ma!!.

Û da em li pirsa xwe, ya bi kêzxitânen ve girêdayî, vegeerin, emê sê rewşan berçav bikin :

1. Qehremanê romanê (daner) bi destên polîsan, ji zîndana mezin (welat) ketiye zîndana biçûk (zîndana mîriya Tirk). Li vir gunehkar, di dîlkirina daner de, dewlet e.

2. Kêzika "biçûk û reş" ji welatê xwe (zîndana mîriya Tirk) bi destên daner ketiye zîndana biçûk ("dembolê mîzê"). Li vir gunehkar di dîlkirina kêzê de, daner e.

3. Eger kêzxitâna folklorî ji welatê xwe (ji wê serfiraziya nav darikên tehliyê), ci

bi destêñ leşkeran, çi li pey keskaya çêkên wan, yan jî li pey rengêñ "jîp" ên wan, daner anîba zîndanê (zîndana mîriya Tirk) ba xwe, hinga serdest nedibû daner, lê dima mîriya Tirk, û daner û kêzê di bin yek pergala bêgunehiyê de, bi destêñ dîlkeran, dîl dibûn. Êdî kêzê dibû mihvana nivîskar û hevalzîndana wî.

Di vî warî de daner karîbû pê re mijûl bibe, pê re bipeyive, wê bi serbestî berde paşila xwe, û bi lebt û livandina wê re êş û jana xwe, wilo jî kul û derdêñ wê, pesin bide. Wilo, kêzê û daner bi şürekî diketin û zîndankirina wan dibû berpirsiyariya yek zorkerî. Lê mixabin ku M. Uzun romana xwe bi ramaniyeke din ava dike, gava xwe li serê "kêzê" dike şûna polîsekî Tirk û wê di zîndanê de dike zîndanê ("dembolê mîzê").

Zargotineke Erebî heye dibêje: ku te yê feqîr dît pêlêke, ti ji xwedayê wî ne bi rehimtir î. Ramaniya M. Uzun jî di çerxa vê zargotinê de digere, gava xwe serdestî wê kêzika "biçûk û reş" dibîne, û nemerdî nake ku moralê wê di zîndana xwe de biperçiqîne.

Daner li vê yekê naraweste, gava propaganda ji xwedanegirtinê re (xwedîlkîrinê) dike, û dibêje, "Tu dizanî, girtîxane unîversîten civakî ne. Eger meriv bixwaze, dikare di girtîxanan de bibe hoste" R. 125, "Lê zordest nikarin têbigîhên, ku girtîxane jî unîversîte ne" R. 125. Dêmek, M. Uzun bi têgihiştin kêza xwe rêkiribû unîversîte!!!.

Ez di vê pirsê de xwe berpirsiyarê tevera kurdi ya siyasî dibînim (bi hêvî me

ku siyasiyêñ Kurd, bi vê çewtiyê, li min zişt nebin), û weku berpirsiyarekî serkêş û bêhempa (di ber tevaya tevgerê de) xwe tavêjim pişt dergûşa M. Uzun, ku van ramanêñ xwe bi ti zimanêñ din belav neke (bila razêñ me di nav me de bi-mînin), da desthilatêñ me ne rake ser lepan!! Ma ne em doza dibistanêñ sereta-yî bi zimanê kurdî ji zarokêñ xwe re dîkin, bê ku haya serdestêñ me jê hebe ku unîversîten me hene. Gidî vê gotinê bela nekin, da serdestêñ me dergehêñ van unîversîtan li ber me nedadin!! Em ketine dawa dê û bavêñ xwe de, bila weku sêwiyê danûk di dawê de li me neyê!!.

Daner di rûpelê 126 an de jî vê behwerriyê berdewam dike, gava dibêje, ku "Girtîxane wekî keçekte nazdar e. Dema te ew xemiland, lê nihêrî, jê hez kir, hingê tu dikarî wê tê bigîhêyî, nêzîkî wê bibî".

Eger ev hevok ne ji avakirina Xavyêr bin jî, lê M. Uzun bi pesnekî wisa nabe klasîkekî Kurd, ji ber dem, war, merc û şêweyêñ zîndarkirina Xavyêr û Uzun jî hev dûr in, eger em li ser taybetiyêñ hiş bal, bîrkêşî û têgihiştinê wan jî nerawestin.

M. Uzun ramaneke din, di warê xwe-avakirineke rewşenbîrî de, diyarî xwênerê romana xwe dike. Ew jî ewe, ku "prinsipeki" pir hêja û balkêş pêş xwêner dike, gava dibêje ku "xwendevanekî baş yê helbestan" R. 204 bû, û prinsîpe wî ew bû ku "Meriv divê helbestê careke din, rêz bi rêz binivîse" R. 204.

Hevalekî min bi qerf digot: Bêkêriya me Ereban ji sê tiştan hatiye,..., ya sisiya

ew e ku Um Kelsûm\* miletê me bi şev şiyar dihişt, da bi roj bikeve xewê!!.

Wilo jî M Uzun ji xwênerê Kurd, di rêya ramanên xwe re, dixwaze ku wextê xwe bi nivîsandina – kopîkirin – helbest û bexşanên çapkirî derbas bike!!.

Va ez aqilçelqqekî wilo me, ku min romana daner pêk anî, û romana "Tu" ji nû ve nivîsand!! De dîse jî barê min ji yê M.Uzun siviktir e, ji ber bi kêmanî niha wî (li gorî "Prinsîpê" xwe) dîwanên "Heyyan,Derwiş,Lorka, Arif û yê din" nivîsandine!!!

### Kelevajiyê romana "Tu"

Bi ser ku hevîrtirşê romana "Tu" kelevajî ye, lê me tiştên herî kelê, bê tam û beloq dibin vî sernavî de civandin, da em şêweyê avakirina romanê ji vî beşî jî bêpar ne-hêlin.

1. Gava daner di rûpelê 55 an de (bêgoman ne di "jîpê" de) lêdanê dixwe, devê wî "dîsa bi tiştekî ron û germ ve tijî dibû. Tahma wê şor bû".

Belê, bi lêdanê xwîn dirije dev. Rast e, ev xwîn bi tihna xwe germ e, lê bêgoman ne şor e. Eger xwîn şor ba, wê cihê dra-kola di mítusa miletan de neba.

2. Di rûpelê 77 an de daner "di salone-ke dirêj û teng de" dixwaze "xwediyê dengê zirav û kelgirî" nas bike. Dixwest "wê jinikê" bibîne. Lê tiştê dibîne "çarşê-fake reş bû". "Dengê wê zirav, zar û zelal bû".

Bi ser vê tevî de daner vê "çarşefê" ji pişta wê nas dike, "ku ew pîrejinék e"!

"Xwedyê dengê zirav" bi zayenda xwe nîr e (ji ber paşdanka zayenda mî 'ya'

ye). Lî, daner li ya xwe siwar dibe, da vî zayendê nîr bixesîne, û ji xwe re bike mîkew. Loma wî parçê cawê reş bi xûzbûna pişte weku pîrejin dinase, ne bi "dengê zirav, zar û zelal"!!

3. Daner di rûpelê 111 an de şîva roja pêşî ji zîndankirina xwe, wilo pesin dide: "mase bi nan, penêr, zeytûn, mast, şîr, hêk ve tijî bûn". "Piştre çay hat".

Di rûpelê 130 de kêran ji bo "savar û nokên xeşandî" li ser masan belav dike. Di rûpelê 131 ê de jî "her roj savar didin" girtiyan, û tu nanê ku didin wan "bavêjî ber kûçikan, ew jî dê ne xwin".

Ev hevok xwe bi xwe şirove dîkin, û pêpêlûka miçiqandina kehniya xwardemeniya girtiyan li gorî merdiya xama daner dihêlin!!

4. Daner di rûpelê 51 ê de xwe bi sedema destnîvîsa xwe ya bi kurdî dide girtin. Di rûpelê 134 an de jî dibêje, "Ez divê xwendin û nivîsandina zimanê xwe zû, pir zû hîn bibim". Lî, di rûpelê 199 an de ji bîr nake, ku "di wextê xwe de, kitabeke hesabê xwendibû" û "çend beyt jî jiber kiribûn".

Daner dibêje ku girtîxan unîversîte ne, xwêner behwer nake! Ma daner ev "kitaba hesabê" ne li unîversîta xwe bi zimanê kurdî xwendiyê!

"Beytên" ku hîna li bîra daner in û di pirtûka wî de hatine raxistin 18 in. Her 18 cotemalik bi kêş û rêzbendên kurdî ne. Dêmek, ev "kitaba hesabê" bi jimareke tenê ji bo daner hatibû çapkîrin!. Fantaziya xewnan jî bi vî rengî li hev nayê!. Na, Ezîz Çaçan [Kaleurdek e, li bajarê Dêrikê dirûne. Mirovekî xwende ye, wilo

jî kurdî bi xwendin nizane.] di fantaziya de ji danerê romana "Tu" xurtire. Dibêje:

Sala 48 an şer giran e (şerê Felestînê). Em şikestine. Teyarên Cihûyan, weku başokê pey çûk bikeve, di ser me re dirêsin. Ji wan pelik bi ser me de weku baranê têne xwar, lê em şerê xwe betal nakin. Di nav re min destê xwe avête pelikekê. Di hişê we de çi tê de nivîsandî bû?. Ez benî, danîbûn: Ezîz Çaçan, em û dijminê xwe ketine pêşîra hev de, û tu mirovекî kurd î, ma ya te çi ye?!

5. Daner di rûpelê 74 an de dibêje, ku "demekê herçî zargotinê kurdî bin, li ser xebitibûyî û hinek ji stranê şînê berhev kiribûn...". Di rûpelê 134 an de jî dibêje: "Ez divê xwendin û nivîsandina zimanê xwe zû, pir zû hîn bibim". Dêmek, daner zimanê xwe, berî bê zîndankirin, bi xwendin û nivîsandin nizane. Èdî dimîne, ku zargotin û stiranê xwe bi zimanekî din civandibin û li ser wan xebitî be.

Li vir pêkenînokeke rûsî hate bîra min. Lî, ji ber ku Rûs pir sixêfoker in, ezê si-xêfîn wan ji wan re bihêlim û kirasekî kurdî li vê pêkenînokê bikim (ez vî mafê diziyyê didime xwe) da hinekîbihna xwe fereh bikim. Ew jî wilô ye :

Dibêjin, hevoka (we serê me êşand) dane heft wergêran. Her wergerek wê vê hevokê wergerîne zimanekî, da yê dawî wê li zimanê wê vegeŕîne. Gava hevok li zimanê xwe vegera, bûbû (me serê we êşand). Ya rast ew e, ku min serê we êşand. Piştî vê vehisandinê, ez dixwazim kulekê ji ser dilê xwe bifîrînim, û pirsekê

ji danerê romana "Tu" bikim :

Ew zarginin û stiranê kurdî, yên ku te berî zîndankirinê dayî hev, bi çi zimanî te nivîsandibûn?. Bersiv çi be jî ne giring e, ji ber tu dixwazî "xwe zû, pir zû" hînî zimanê xwe bikî. Lî, hêviya min ew e, ku tu wan nivîsandinê folklorî ji zimanê ku pê hatî nivîsandin ne wergerînî kurdî (ji ber ku folklor weku hêka qitikê zû disile), da nekevin wêraniya pê-kenînokê.

Halo, me lêkolîna xwe bi dawî anî. Bi vê bidawîanînê re jî, emê romanê û romannivîs bi du xalan nirx bikin :

1. Daner, tenha pesnekî fotografi ji qehremanê romana xwe re dide, tenha wan ji der ve dibîne û wan li gorî banê huneriya xwe diaxivîne. Wilo, ne bi hişekî torevanî ne jî bi dîtineke rewşenbirî dihingive kesên romana xwe, da karibe heyberê xwe bi şêweyekî bîrkêş ava bike.

2. Hişê nivîskar, bi bêserûberiya xwe, ne desthilat e, ku xwe derbasî nava qehremanê romana xwe bike û hestêwan pêş xwêner bike. Loma pesnê wî sere sere hatine, û danûstandineke xav û xil li ser zimanê wan dike. Loma jî bûyer û serpêhatiyêniyyana xwe dike berhem ji romana xwe re. Bo vê yekê roman (weku heyber) û kesên wê (weku qehreman) dimînin dûmahiya kesîtiya nivîskar, û di desten wî de dibin alavêne derkirina têgihiştînê wî, yên torevanî, civakî, zanistî û sisîyasî, û li gorî banê van têgihiştinan bi erkên xwe dirabin.

Ev herdu xal jî, xwe di rêya romana kesnameyi re belû dikin. Loma me ev romana kesnameyi bi "Uzunname" da na-sîn û rexne kir.

Vêce, çîma me ev barê giran hilgirt û romana "Tu" bi vê ferehiyê, weku nimûne di romana kurdî de, rexne kir?

Mixabin ku ev war ne warê min e. Ji ber xwendina min endazeyarî ye, û ji endazeyariyê jî ya petrolê ye. Û ji ber ez nizanim bersiva pîrsa xwe bi kurtî rastûrê raxim, ezê di rîya serpêhatikê re berçav bikim.

Dibêjin, du xortan kazoz (sînalco) ve-dixwarin yek li hevalê xwe zîvirî û got:

— Ka ew kazoza berê, ku pozê mirov dişewitand û rondik ji çavan digindiran-din!

— Birako, kazoz ew kazoz e, lê namûs di pozê me de nemaye, da bişewite — yê din lê vegerand.

Ez qurbana wî spesyalistê kurd im, ku rexna kurdî li ser bingihin zanistî ava bîke. De gava rexne bi erkên xwe rabe, wê heyberê kurdî jî spehî ava bibe.

Dawî dimîne ku spasiyeke gewre pêş-kêşî nivîskarê romana "Tu" M. Uzun bîkin, ku xwe kire nimûne ji rexna me re. Belê, ev rengê rexnê ne tenha li ser romana "Tu" ava dibe, lê bihtiîrin berhemên kurdî berqef dike. ☐

### Dawî

\*Um Kelsûm: Dengbêja herî bi nav û deng e, li Misrê û li hemû welatên ereban.

### Çavkehniyên lêkolinê :

1. Romana "TU". Mehmet Uzun. Stockholm 1984.
2. Ferhenga Kurdî nûjen A. S. A. Gewra-

nî – Emman 1985.

3. Rêbera rêzimanî E. R. Ekrawî ç. I 1980
4. Rêzimanê zimanê Kurdî bo kursê II Berhevkirina Zagrosê Haco – destnivîs.
5. Kurdsko – Russkiy frazeologîçeskij slovari, M. Ü Xamoyan, Êrivan 1979
6. Grammatika Kurdkogo yazïka, K. K. Kurdoëv, 1957
7. Nêmetsko – Russkiy slovari – Moskva 1973
8. Al-Arabî, oktober 1993 r. 150
9. Al-Arabî, January 1994 r. 71, r. 126
10. Nezeriyat elteelim - Dirase muqare-ne, Corc Um Xazdavwe axerîn, Alem el-meerîfe, r 70, 1983
11. Elşefahiye we el kitabiye, Walter C. Onc, Alem elmeerîfe, 182
12. El itîcah elqewmî fi elîrwaye, Dr. Mustefa Ebdilxenî, Alem elmeerîfe, 188
13. Elmelheme we elîrwaye beyne Baxtîn we Lokaç, Mehmûd Ebd Elwahid, El-meerîfe, 263, r. 157–165
14. Qîrae fi elwaqîye el neqdiye, Morîs Cancî, Elmeerîfe 272, r. 144–161
15. Dîrasat fi elqise elqesîre, Yûsif Elşarû-nî, Dîmeşq
16. 1989 Elqise fi el weten elerebî, Muhsin Yûsif, Terablus 1985



**Bi şasîti ev beşê li jêr ji lêkolîna Rezo ya li ser pirtûka M. Uzun, di hejmara 2-an ya Dugirê de nehatibû çapkirin. Hun û lêkolînvan li me negirin, spas!**

## **Uzunname II**

### **Hevokên romana "Tu"-yê**

Bêguman, miletê Kurd, di rojhilata na-vîn de, yek ji miletên herî kevnar e. Wilo ji zimanê kurdî, di vê herêmê de, yek ji zimanên herî kevnar e. Dêmek, bê çawa taybetiyêن civak, jiyan û geografiya kurdî hebûn û hene, wê taybetiyêن zimanê kurdî jî hebin û gerek e bimînin. Belê, ziman roleke pir giring û hêja, di warê hebûn û parastina gel de, leyistiye û hîna dileyize. Lê, iro roj berdewamiya vê rola objektîv ji rewşenbirê kurd tê xwestin. Ji ber êdî ne tenha maye, ku ziman gel bipparêze, lê bû ye ku gel vêce ziman bi-parêze. Ü ev yek jî, di behweriyêن min de, bi forma avakirina rast û durust ve, bi mijûliyeke kurdî paqij ve, tê girêdan.

Ne dûr e, ku behweriyêن min, di vî warî de, ji behweriyêن gelek nivîskar cu-da bin. Lê çawa be gerek e rewşenbirê Kurd, berî ku raje pênûsa xwe, karibe bi hişekî kurdî ji xwe re mijûl bibe (û ev problêma nivîskaren me ye), da karibe hevokeke kurdî paqij ava bike, û behhe-mên xwe bi zimanekî sivik û rewan bine-qışine, da karibe vî zimanî bi taybetiyêن wî ve bi pêş ve bibe. Erê, tişte herî giran

ew e, ku mirov bingehêن zimanê xwe, bi nezanî,bihêrivîne. Anglo, xwe bispêre formêن avakirinê biyanî û taybetiyêن zi-manê xwe dûr bavêje.

Ne dûr e, ku gelek bi seyr bipirsin: "Ma kî dikare dest bavêje bingehêن zi-manê xwe, û wan bihêrivîne ?!". Belê, ev pirseke durust e... ma "kî tiliha xwe dixe çavê xwe!!". Lê dive em jibîr nekin, ku tiliha me bê hemdê me (ne bi daxwaza me) dikeve çavê me de. Çawa?. Bi asa-nî... Ji ber me bi zimanê xwe ne xwendî-ye, em fêrî avakirinê hevokên biyanî (çî yêن serdestêن me – di rêya dibistan, rá-yo, televizyon...ûyd. de –, çî ji yêن kultûra cihani) bûne. Bi kurtî, em bi hişê biyanî diramin, tanî em nema, çî yêن me ne, çî ne yêن me ne, ji hev derdixin. Wilo, em hin bi hin dûrî taybetiyêن xwe (çî ci-vakî bin, çî zimanî bin) dikevin.

Ü da ez karibim behweriyêن xwe bihtir bidin nasîn, ezê li ser avakirina hevoka kurdî rawestim (ne dûr e ev baber, di pêş de, bibe derîkî lêkolînan) û danûstandi-nekê, di warê fraziolojiya kurdî de, bi xwêner re vekim. Belê, ez li ser şêweyêن sade û hevbend, di hevoka kurdî de, na-rawestim. Wilo jî, ez li ser beşen rêzimanî di avakirina hevokan de (hevoka na-van, hevoka hevalkarî, hevoka saloxî, hevoka pîrsiyarî, hevoka merbendî, hevoka fermanî... ûyd) narawestim. Lê, ezê li ser taybetiyekê din, di hevoka kurdî de, ra-westim-taybetiya fraziolojî di avakirina heyber de.

Du beşen hevoka kurdî, di warê fraziolojî de, hene. Her beşek jî hin grûpêن hevokên serbixwe himbêz dike.

## **1. Hevoka step (qesp)**

Ev beşê hevokan guhertinê nawergirê, û nivîskar ne xwedî desthilat e ku hunerê xwe di guhertina wan de nîşan bike. Ji van hevokan: zargotinên kurdî, gotinên folklorî, cindîtiya gel... û y.d.

## **2. Hevoka pexox (fiş)**

Ev beş jî; wan hevokên ku nivîskar desthilatî guhertina struktûra wan be, di bin baskên xwe de, dicivînin. Û nivîskar dikare, di rîya van guhertinan ve, hunerên xwe berçav bike. Ji van hevokan: Hevokên bi jiyana civakî, eborî, siyâsî, zinasî... ûyd. ve girêdayî ne.

### **Rengên hevoka step**

Hevoka step grûpeke pir mezin, di frasiolojia kurdî de, bi xwe ve girêdide:

#### **a. Hevoka olî**

Kurdan, li gorî civak û zimanê xwe, gelek hevokên olî afîrandine. Ev hevok tenha di warê karêñ oldarî de têne pêkanîn:

Filan kes werd kişandin, filan kes dest û rûyê xwe buwart, filan kes destlimêj girt, filan kes destlimêja xwe şikand... ûyd.

Belê, werdkisandin ne leystika tizbiha ye, dest û rûbuwartin ne dest û rûşûştin e. Wilo jî destlimêşikandin ne avrijandin e, yan jî derketina derve ye. Ji ber ev pîşk karekî serbixwe dide naşîn. Dêmek taybetiyeke hevoka olî heye, ku nivîskar ne desthilatê guhertina forma wê ye.

#### **b. Hevoka dudîl**

Ev rengê hevokan danasîneke alîkar ji hê-

la nivîskar ve dixwaze. Çi ev danasîn di bedena heyber de be, ci jî rastûrê be. Weku:

Mûyên laşê filan kes bûne bist, filan kes depikên xwe li hev xistin, barê filan kes giran e... û y.d.

Grûpa van hevokan dudilîkê, bi xwêner re, çêdike. Loma alîkarî ji hêla nivîskar ve gerek e, ji ber ku bi hêrzên tirs û mîraniyê re mûyên lêş dibne bist. Levdana depikan dibe gelacî (fitne), û dibe pêkanîna karekî pelandî. Barê gora jî dibe ku pelandî be (maddî be), û dibe ku ne-pelandî be (me'newî be). Lê çawa be, nivîskar ne desthilatê destavêtina struktûra vê grûpa hevoka ye.

#### **c. Hevoka bêbiheng**

Hevoka bêbiheng dikeve warê avakirinê bêşûd de. Lê forma xwe di zimanê kurdî de bi rengekî step standiye. Weku:

Nan û mast, taştya bi rast. Nan û dew teştiya derew. şîr qeweta kîr... ûyd.

Ev grûpa hevokan bê bingeh hatiye avakirin, ji ber ku xwarina nan û mîst nabe taştya herî çak, hêja û bi menaşe. Wilo jî xwarina nan û dew ne mana xwirînî ye. Û nabe tu bêjî. filan kes nan û şîr xwar û çû nav livîna xwe, dêmek mîrânî jê diherike. Na... Lê vê grûpa hevokan, di zargotina kurdî de, cih girtiye. Ji hêle-kê ve, lihevhatineke fonetîkî diyar dike... ji hêla din ve, pêpelûkên çetiyyê berçav dike.

#### **d. Hevoka şirovekîrî**

Gelek gotinên (bêjeyên) kurdî hene, ku ew bi teka xwe hevokê, di nava xwe de,

ava dikan, û gerekî şirovekirinê nabin. Weku:

filan kes ji şer pozfirkandî derket, filan kes çavşikestî bar kir, filan kes serdiberde di ber filan kes re derbas bû... û y.d.

Ev karnavên pozfirkandî, çavşikestî û serdiberde hevokên xwe şirove dikan û bûyerê berçav dikan.

#### e. Hevoka nenas

Ev grûpa hevokan bi herêmeke teng ve, bi grûpek gelî biçûk ve hatine girêdan û li ba wan nas û cihgirtî ne. Ev grûpe li ser bingehêن serpêhatîkê, bûyerekê, yan jî rewşekê hatine avakirin, û karakterê vê heremê û kesên wê, di nava xwe de, berçav dike, Weku: "bifire jî, bizin e!", "Meyzê, bê ew qurmê reş ne kera mey boz e!", "Apê Rîxo, navê bavê te çi ye?"... û y.d.

Hevoka pêşî bi deşta şingalê ve girêdayî ye. Çawa du kes, ji dûr ve, reşekî dibînin. Yek dibêje, teyr e (balinde ye)— Yek jî dibêje, na bizin e. Piştî nêzîkî reşê xwe dibin, ew difire. Lê, yê gotî bizin e ji ya xwe danakeve û dibêje: "Bifire jî bizin e!".

Hevoka navê bi bûyerekere gundê Darê ve (Bakurê Kurdistanê) girêdayî ye. Di vê bûyerê de, kera yekî gundî winda dike. Piştî lêgerekere dom, dibake gundîkî xwe, ku di newalê de ye: Meyzê, bê ew qurmê reş ne kera mey boz e!. Hevoka dawî bi deşta Cizîrê ve girêdayî ye. Di vê bûyerê de yek ji mihvanekî gund dipirse: navê te çiye?".

#### f. Hevoka dengan

Ev grûpa hevokan bi hevbendiya du

dengan ava dibe, û avêtina dengekî (yan jî guhertina wî) hevokê ji gurd dixe. Weku:

Dim-dim, req-req, fiz-fiz, çîw-çîw... û y.d.

Gava mirov bêje: "Ew kî ye, dim-dim dike?", "bû req-reqa ewran", "bû fiz-fiza bê" û "bû çîw-çîwa çûkan", hevokeke gurdikî ji nav lêvan derdixe. Lê, gava mirov "dim" ekê, "fiz" ekê û "çîw" ekê ji vê hevbendiyê rake, hevok şejna xwe winda dike û bê wate dimîne.

#### g. Hevoka dupesin

Di vê grûpa hevokan de, hevbendiya du pesnan rola herî giring, di avakirin û wata hevokê de, dileyize. Û avêtina pesnekî, hevokê dihêrivîne. Weku: şût û rût, xil û xav, dîn û mîn ( dîno-mîno ), hûr û mûr... û y.d.

Ji ber kesê "şût", ew kesê şahîk e. Lê kesê "şût û rût", ew kesê tiştekî wî nebe. Wilo jî, kesê "dîn", ew kesê ku hiş û sewdan bi der dabin. Lê kesê "dîno-mîno", ew kesê ku xwe bi xwe li dînîtiyê rast dike, da xwe ji raweşke neçar, ji davêkê xelas bike.

#### Gotinêñ step (qesp)


Piştî vê yekê, dimîne ez li ser gotinêñ step di hevoka kurdî de rawestim û gi-ringiya wan, di hevokê de berçav bikim.

Gotinêñ step dikevine hevokêñ step û pexox de û struktûra avakirina wan bi xwe ve girêdidin. Guhertina van gotinan hevokê dihêrivîne, û hevok, wê çaxê, namîne hevokeke kurdî. Weku nimûne:

## 1. Di hevoka step de

"Şûr simbêlê wî nabire", "pisîk nanê wî dixwe", "golikê paçikxwer e"...ûyd.

Şûr, pisîk û golik gotinê step in di van hevokên step de. Dêmek, guhertina van gotinan rola hêrivandina struktûra hevokê dileyize. Belê, eger em şûna "şûr" meqes deynin, şûna "pisîkê" keftar deynin û şûna "golik" hesp deynin, wê ev hevok bibine çi?. Bi kurtî, wê bihêrinvin û bêşûd bimînin.





## 2. Di hevoka pexox de


"Memo bistek goşt xiste tenûrê", "Kebaniya malê kelek kutilk keland", "Zinê dewlek av kişand"...ûyd.

Goşt, kutilk û av gotinê step in di van hevokên pexox de. Dêmek, bi guhartina van gotinan wata hevokan jî tê guhertin. Lê kirde û lêker, di van hevokên pexox de, dikevine bin barê guhertinê bê ku hevok wata xwe winda bike. Anglo, bi guhertina kirde û lêker re, hevok durist dimîne. Wilo:

(Min, te, wî, me, we, wan) goşt (biraşt, bi dar ve kir, çêkir...), (Min, te....., wan) kutilk (dagirtin, nimandin, di ber avê de kirin...), (Min, te, ..., wan) av (anî, ri-jand, rejand...)



\*Ev sernavekî beşê teorî ye ji lêkolîna romana M.Uzun re.



## Dewleta Dostikî – Ronîkirina çend aliyên şaristanî –

**D**ewleta Dostikî (Merwanî) p.z. di sala 982-an de hatiye damezirandin Damezrênerê vê dewletê Badê Dostikî bû (1). Bad jî, di wexta xwe de, bi mîranî û cegerdarî û bîrtûjî û şarezayiyê hatibû naskirin. Ibin Elesî di pirtûka xwe de ya bi navê (Elkamil Fî El-tarî) de dibêje ku xîlîfeyê Ebasiyan (Udid El-dewle) wexta bi Badê Dostikî re civiya, bi dizî ji wezîrê xwe re gotiye ku ev zilam mirovan ditir-sîne. Wa dixuye ku Bad bi xwe jî di çavîn xelîfî de hin tişt xwendibûn, lewra şîya ligel siwar û leşkerên xwe ji qesîrê bireve û xwe ji tora xelîfê û leşkerên wî rizgar bike.

Piştî wê dest bi avakirina dewleta xwe ya di çesnê stiraneke kurdî de, dike.

Di destpêkê de êrişa xwe dibe ser Ardîş (2) û yeko yeko piştî hinartina nameyan, keleb û bajarên kurdan dergehên xwe bê xwîn rijandin li ber wî vedikin. Bi vî awayî navûdengê Bad belav dibe û dewletên cîran ji tîrsa xwe re, bi taybetî dewleta Biweyhî û xîlafeta Ebasi dest amade-kirina hêz û betalyanên xwe dikin da ku

li bermberî destkeftin û berfirehkirina dewleta wî rawestin. Gelek caran hewlî dane ku wî bikujin. Di êrişa xwe ya li ser Mûsilê de, Bad vê carê bi rastî têt kuştin.

Rawestana li ser şexsiyeta Bad pêdiviyî lêkolîneke taybetî ye digel ku jiyana wî tarî û di çavkaniyên dîrokî de ne ewqasî zelal e.

Navê wî Husênenê Ebdulahê Dostikî ye û ji kurdên Harbextî ye, ji mîrên Botan e.

Piştî Mirina Bad, Ebasiyan û Biweyhîyan û romê wa texmîn kirin ku êdî ji tîrs-nakiya dewleta dostikiyan xelas bûn, lê belê berevajî gumana wan, cîgir û mîrat-girên Badî, bi taybetî Ebû Elî kurê Merwanî, di demeke kurt de şîya bajarên xwe ji nû ve asê bike û hêza xwe jî careke dî berhev û tundtir bike.

Ibnû Kesîrê Dîmeşqî vê yekê bêtir zelal dike: "xelîfeyê Fatimiyan şandeyeke giranbuha digel diyarî û entîkeyan hinartî bû cem Mîr Ebû Elî û hebûa dewletê pejirandibû, herwilo xelîfeyê Ebasiyan û Imperatorê pîzantian jî her yekî ji milê

xwe ve daxwaza hevalbendî û sînorbendiyeke hêja jê dixwestin”.

## Firehbûna Dewleta Dostikî

Destnîşankirina firehbûna û zemîna ku dewlwt li ser ava bûbû, hinekî aloz e. Lî eger em navce û herêmên di bin destê dewletê de bi sînor bikin renge em bikaribin di vî warî de wêneyekê di hişê xwe de ji berfirehiya wê dewletê re dirust bikin (3).

Miyafarqîn (Paytext), Diyarbekir, Ar-  
dîş, Nîsîbîn, Mêrdîn, Reha (Urfa), Mûş,  
Wan, Hesen-kêf, Xerbût, Botan, Qamış-  
lo, Amûdê, Serêkaniyê û Dêrikê û Dir-  
bêsiyê.

Diyar e ku hemî xaka kurdan neketibû bin destê Dostikiyan. Lewra ji bo ku em wêneya giştî ya vê dewletê bizanibin gerek nexşeya siyasî ya wê serdemê li ber dest be, gerek em bişen nakokiyên siyasî û hêzên leşkerî û tengên pevçnê, binasin, û em bikaribin çawatiya dànûstendina Dostikiyan bi xwe bi wan rûdan û bûyeran re, têbigihêjin.

Dewleta Biweyhî û xîlafeta Ebasî wê wextê li Bexdayê bûn, û xîlafeta Fatimî jî li Misrê bû, di navbera wan de her û her li ser serkêsiya Misulmanan pevçûn ranediwestiya. Li milê dî, Imperatotiya Bî-  
zantî jî fileh diparastin û di navbera van hersê dewlatan de, berî hatina Selçukiyan (4), pevçûna ji bo daqurtandina dewletên  
biçük li dar bû.

Digel ku Mîrên Dostikiyan carcaran diyarî ji pîzantayê re, lê ne wek Hemedâniyên Helebê di şûna bacê de, dişndin. Herweha peywendiyên wan ên siyasî û

aborî wek ku çawan ligel Ebasiyan hebûn wisa jî ligel Fatimiyan berdewam bûn.

Vê siyaseta bê alîgirî hiştiye ku dewleta Dostikî, hem cihekî taybetî di herêmê de ji xwe re qezenc bike û hem jî dewleta xwe ji şer û pevçûna bi cîranan re biparêze. Lewra wextekî pir hêja ji bo avakirin û pêşvebirina dewlwtê bi destxistibûn, bûbû penageha hemî perîşan û renckêşen navçeyê.

Di qûmistana dorhêlê de dewleta Dostikiyan ji ber geşbûn û lêewlwbûnê bûbû bazargeha bikaranînâ sermiyanên bazirganên herêmê, tenê li wê dewletê dikarîbûn bê rîbirr û pêxwas û bêyî tawankariyan bazirganiya xwe berdewam bikiranâ.

Ibnû Kesîr Eldîmeşqî di vî warî de wisa dibêje: ”Ibn Elbehât ê bazirgan di rojekê de 500 Dînarên bîzantî qezenc dikir”.

Ibnulfariqî jî dibêje ku, Dewleta Dostikî li rada desthilata xwe sermiyanê tu kesî ji wan nedistend; ji bilî mirovekî bi navê (Ibn Elcurî) ku çek di mala wî de dîtbûn, wek nokerekî ji bo welatekî dî hatibû nav wan dixebeitî.

Dîroknaşen ku li ser qonaxa dîrokî ya navçeyê radiwestin didin xuyanîkirin ku Nesir Eldewle - Ebû Elî bi vî nasnavê ku diyariya Xelîfeyê Ebasiyan bû dihat bi navkirin- Mîrê Dostikiyan, mirovekî siyasî, şareza û hişmendekî bê hempa bû.

Di têgihiştina hunera desthilatdariya dewletê de dûrbîn bû, lewra şiya gelê xwe di aşîtî û xweşiyê de bihêle. Li seranseri 53 ê salan bi hiştûjî dànûstendin ligel dewlet û imperetorên herêmê dikir bêyî ku welatê xwe hogirî asteng û nakokiyên

siyâsî bike. Herweha beşdarî çareserkirîna pirsgirêkên di navbera dewletên navçeyê de, dibû.

Bi kurtî, Dewleta Dostikî, dîgel cegerdarî û hemî hêzdariya xwe jî, li dijî şer râdiwestiya, bi awakî giranbuha li jiyana mirovên xwe temâşedikirin. Wexta ku êrîşen derve dihatin ser dewletê (Nesir El-dewle) wezîrê xwe û çend serlesker dihinartin meydana şer da ku raportekê li ser hêza dijmin ûbihayê aborî yê serkeftinê amade bikin. Piştî raporê ferman di-da wan û digot: "Ewqase pere bidin wan da ku bela xwe ji şer vekin". Bi vî awayî giyanêñ xelkê diparast. Elfariqî û Ibin Elesîr di vî warî de wisa dibêjin: "Nesir El-dewle da ku dewleta xwe ji şer biparêze pêncî hezar dînar dabû herdû serleskerên Minxoliyan Ebû Qar û Nahifî herwisa dabû Bedranê kurê Eqîl, Mîrê Ereban."

### Dewleta Dostikî û hunera avahîyê

Jibermayî û kavil û şûnşopêñ hunera avahîyê yên dewleta Dostikiyan mirovan mit û mat dikin. Di wê wextê de, û di wê navçeya ku bi şer û pevçûnan mijûl bû, Dostikiyan berê xwe dabûn avakirina pêdiviyêñ jiyaneke xweş, hewl didan ku xwe ji ber pevçûnan bidin alî da ku xwe ji avakirina şaristaniya mirovane re û xwe ji avakirina welatekî bajarvanî û xweşkirina jiyana xelkêñ wî welatî re, vala bikin.

Jî nû ve tekûzkirina Keleha Amedê û ji nû ve tebûtkirina sûra wê û keleha Batmanê û sûrêñ Miyafarqîn û pirêñ asê li ser çemê Batmanê û kelehêñ Botan, tev, çend nimûne ne ji hunera avhiya Dostî-

kiyên ku navêñ xwe û navêñ avahîkar û hostayêñ kurd li ser wan kavilan kolandine.

Herwisa, Dostikiya bi awakî pir balkêş guh dabûn avakirina bazaran û kolanan û hew dabûn ku ava paqîj li hemî bajêr belav bikin.

Bêguman hemî avahî û eywanêñ ku di wexta Dostikiyan de avadibûn, wek pîse û hunereke spehî; bi taybetmendiya giyanê kurdan ve girêdayî bûn. Lewra ji yên herêmê û ji hunera avahiya Romanî pir cihê bûn. □

### Berdewam dike





## Pirtûka kulîlkan

Ji kulîlkan hez dikim lê tu tişti ji wan fam nakim. Renge hemî xelk wisa bin. Lê ez bi xwe wan wek xuşkên xwe dibînim. Serhişkiya min kulîlkeke tûj e ji kîmyaya damaran e. Lîvîn min ên xwesik di çesnê kulîlkeke nebişkivî de ne. Dilê min digel dudiliya xwe di riha Apê min de dijene. Destêن min jî mîna çequ'lén li ser keviya gola Sado; di qehwa sibe'hê de, dilerizin. Cîgehêن min wek kulîl-kên bihîvîn Mele Hesen in; Mele Hesen ê ku bi werz û rovî û çelekên xwe sermest û dadayî bû. Biçûk bûm, kulîlka dayika xwe bûm, dayika ku li ser keviyên çewalan rûniştiye û bi valahiya xwe re digunce. Hermela dîwaran bûm, hermela ku bi demek kurt re digunciya... Şêrînê! Şêrînê!

"EZ nêrgiza Sharon im, sosina gelîyan, yara min di nav keçan de wek sosina di nav stiriyan de ye. Yara min di nav lawan de wek sêva di nav dara tehtê de ye, dilê min bijiya rûniştina li bin siya wê û mîweya wê jî ji bo gewriya min şêrîn e."

Şêrînê, berya ku kulîlka zer a penceşêrê (kanser) wê hilke; ez hînî kulîlkan kiri-bûm. Em li teniştâ perjanêن yasemînan radiwestiyan, leşkerên kevnar jî li teniştâ

me radiwestiyan, ji kevirê Ataturk hetanî wan perjanêن ku mîna taristanê kûr bilind dibûn. Yasemînan serserîtiya xwe li ser perjanan girêdîdan, evîn ji me re ron dikirin, lê tunebûna yasemînan di destni-vîsa Apê min de cihê daxê bû. Yasemîn nas nedikirin, hetanî roja mirina wî ya sîpî jî yasemîn nas nedikirin.

Balkonêن Skandinavyayê, pencereyên xaniyên wê, êvarêن zuhatiyê, çîrên wê yên di sedemên xwe de rewan in, kulîl-kên dilbijandina séksî, kulîl-kên cejnan, kulîl-kên xatirxwestinê, kulîl-kên kîmasiyê, kulîl-kên ku di bagerê de xirecirê di-kin, kulîl-kên dûr û têkper (ji nişkêve), berhest (mehsûs), dudil, her û her ji bo kulîlkan ji sozên xwe dereng mame. ku-lîl di têlên Gîtarê de, kulîl di birîna min de; eger Damyana dereng ma, û ji kulîlkan jî, Apê min; ximava (hibra) pirtûka xwe derxistibû, û bi kulîlka hinê; si-pîbûna riha xwe; bi keskê gumanan çîrandibû, destêن hemî Bedirxaniyan zeft-kiribû û hestêن Amûda di bakurê xwe de; şanî wan dikir. Di xwarina kulîl-kên xemgîn de û di li ser goristanan belavkiri-na wan de, zana bû. Wêneya wî bi dar-

bestan û bi zeyzefûna tenhatiyê têt çiran-din. Bi cihkirina rewan a miriyan di kor-talên Hesenê Gunreş de; Apê min diêşî-ne. Bi matmayîn dike kurtepist, destma-leke biçük derdixe, benêñ kerker (kefen) vedike, û eniyêñ miriyan; mîna ku di nav-destêñ wî de kulîkine biçük bin, mist di-de:

— Ez dizanim ku xwêdan didin.

Di navbera sîberêñ xwe û tozê de gun-cînekê durist dike, carcaran bi wan re di-çû, dûr diçû, li ser hemî kulîkkêñ Kurdis-tanê difiriya.

— Ma xwene tu mêşahingiv ì, de dev ji vê adetê berd malava?

Besnê gazinêñ xwe dikir, lê Apê min dibîşirî:

— Erê ez mêşahingiv im.

Rewşa wî rewşekê taybetî bû, tûtina nû, û seetêñ ku jê re dihatin, seetêñ miri-yan ji bo wî bûn, para wî bûn

— Ez tu tiştî ji bilî seeta wî naxwazim, ma piştî mirinê dê çi bike jê?

— Lê seeta Hec Ebdo mala Apê min wêrankiribû:

— Tu yê kinga bimirî lo?

— Wexta ku kulîk li ser kevirêñ min şîn bêñ.

Kulîk ne tenê li ser kevirêñ wî; lê li ser dergûşa kurê Şevê ( navê jinekê ye ), li ser asîtanka axur, li ser qebqeba kewê, li ser minara mizgeftê ya bi ser hewşa wî de çemyayî, li ser çaroxa wî, li ser katjimê-rêñ sibeha wî wexta ku li ser keviran li navêñ penaberan digeriya, şîn têñ.

— Bi çi zimanî?

Zimanê balendeyan, zimanê kulîkkan, zimanê çarşemê, zimanê Şêx Seîd , ku li

ser pirê bi leşkeran dorpêçkirîye; wexta ku radiweste da ku wêneya wî ya dawîn bikişînin:

— Ey Qazî Muhemed! Bo çi destêñ te; wek xaçekî; li ser hevdû ne, Destêñ xwe ji hevûdû vek... Bibîşir... Piçekî wê xem-gîniya giranbuha biparêz?

Pencereyên Iskandnavyayê, avgîra (hewza) herçar masiyan, kevz xwe li ba dike, barûd li jor e, çar masiyan rengîn; çar alî ne, Cegerxwîm dibêje ku herçar alî aliyêñ kulîkkan in, berê xwe dide firosge-heke gulan, li gel heftê saliya xwe; gurze-ke gulêñ zer dikire, li ser kaxezake biçük dinivisîne/ Ji bo Olof Palmê /gurza gulan bi dizî bi rengekî zer dinuxumîne, ji Mit-royê derdiçe, di gavêñ xwe de seqemê har dike, gurza gulan di bin yelekê xwe de vedişere, yelekê gulgulî yê di çesnê perde-yên Kafafîs de, bi lez, hêdî hêdî, Qamiş-lokê û navêñ nû yên gundêñ kavîlbûyî yên Amûdê tîne bîra xwe, navêñ kenokî yên ku di arşîfîn nifûsê de hatîbûn gu-hertin û nivîsandin:

— Ew arşîf defterêñ min bûn, min bi xwe navêñ gundan di wan de nivîsandibû,

— Kîjan gund ey Bedirxanîno?

— Gundêñ Cegerxwîn.

Gir navêñ xwe ji ber dikin, di qatêñ xwe de kulîkkêñ xwe vedişerîn, di her qa-tekê de celebek, û di pirtûka Apê min de; gelek celebêñ seyr ji kulîkkan; û ji gîhayêñ biçük û germ; hatîbûn dîtin, wêneyêñ gelek gulîkkan jî di pirtûkê de hatîbûn bi cih kirin. Rengê vê kulîkê hêjayî Ehme-dê Xanî ye, tengê vê kulîkê jî li gel Lorka digunce, û tengê pûngê li gel tevan di-

gunce, na...! Tenê li gel min digunce, ev reng tenê ji bo min hatiye çekirin, ez dê rê nedim tu kesî ku vî rengê min dagîr bike.

\*\*\*\*

Di buharê de; hemî zilam hildikişin ser giran, bînçikandî ji gundekî ber bi gundekî dîtûr ve diçin û li nameyên Şêx Seîd ên ku ji Apê min re hinartibûn, lê negihiştibûn, digerin. Tekelên piskeleterê wan cirîdê bi hev re dîkin, qutâyên tûtinê ji bêrîka hina dikevin, keseran dikişînin, pif hişkahîya kulîlkênen tiliyêن xwe dîkin, hildikişin/ dadikevin, cigareyan dipêçin, bîna werîsên kevnar dikişînin, zirav in, lê dikarin lingêن Şêx Seîd li ber bayî bihejînin:

— Bi şimayê nixumandine.

Têla qalind a Gîtara sazbendê Ispanî, hûnandîye; lê bi dilovanî, bi tiliya xwe; sazê bi paniya pêlava Damyanayê re diguncîne, û Damyanayê jî porê xwe yê reş di nav destê min de vedike, guleke sor ji nav porê xwe derdixîne, kulîlkênen biçûk û bişkojan hildike, wan davêje guldanka mişt av: Ev qeyikên min in, ez ji Xirnatayê me, ez jî gola Sado me, de were da ku ez vê serpêhatiyê ji te re bibêjim:

Hebû nebû rehme li dê û bavê min û te bû:

Bêtirî 100 kurdî ji alî leşkerên turk ve hatibûn xeniqandin, piştî ku ew xistibûn kîsên dev asê, ew avêtitibûn Behra Wanê.

Wexta ku Şêrînê li dergehê min dixîne; kulîlka kindirê û kulîlka êvarê û wêneyên yêن xeniqandî di neynikê de rengvedi-

din, di koşeyeke neynikê de; guleke mezin, guleke zer û bişkivî, di çesnê nexweskî de, stûyê xwe bi ser ximava destê min de wexta ku dudiliya êrifker dinivîsînim, diçemîne. Ji bo ci kulîlk? Kê bi van xuşkênen spehî dest pê kiriye? Satilek ji sıfir, di satilê de qefdêñ lezok ên kulîlkênen xelmaşbûnê, hemî kulîlk mirovan xelmaş dîkin, Damyanayê wisa dibêje, tûtina min kulîlk in, Sado dibêje û berdewam dîke: Ez ne qaçaxiya tûtinê lê ya kulîlkênen Torosî dikim.

— De fêri cigarekêşanê bibin lao da ku di pîrbûna min de hûn cigareyan ji min te bipêçin.

Satilek sıfir ji destên dayika min bo roviyan û bo kulîlkênen havînê, satila Apê min jî bi ximava wî û bi helbestê wî yên efsanewî yên li ser navêن kulîlkan, nîmandiye.

Min navê kulîlkan afirandine, hemî nav navêن min in, milkêن min in. Mafê te nîn e ey Cegerxwîn tu nêzîkî wan bibî, bi sîbera xwe re dipeyive. Bînteng dibe, bi lez ba dikişîne sînga xwe û bi herdû çavêن xwe yên mişt hêşir bi pey rengêن vê berbangê dîkeve.

Amûdê di xewê de ye.. Dengê zîqezîqa tekelên erebanan ji dorhêla bajêr dibihîze, Renge (belkî) şandeyekî Şêx Seîd be.. Na, ev zîqezîq cihê ye! Vê carê nameyên wî pir derng mane. Nameya dawîn a ku jê wergirtibû, çend dilopêن xwîna zuha li ser dixuyan, lewra ji wê wextê ve tirseke ne diyar hest dikir:

— Ma gelo ev xwîn e yan rengêن kulîlkênen Şêx Seîd in?

Tiliya xwe birîndar kir, û dilopêن xwî-

na xwe bi ser kaxezke dîtir de niqutan-din.

— Xwîn ji Diyarbekrê hetanî riha min dinuquête.

Name wek ku hebû, li ser rûpelekî ji destnivîsa xwe ,çesipand, û hawirdorî nameyê bi kulîlkên sipî xemiland

\*\*\*

Şêrînê bi xwe nizanîbû kulîlk çi ne, ew hildikirin û dixwarin, bi riha Apê min dilîst û jê re digot: Evênu ku li ser riha te yî kesk mane çi ne?

— Kulîlk in... Kulîlk in Şêrîna min!

Kulîlka yekemîn a ku min kirîbû, ku-lîlka sor a qurnefelê bû, min diyarî jina hevalê xwe kir, şerm kir.. Kulîlka sor a evîndaran bû. Ma gelo min jê hezdikir? Lîvîn wê di çesnê du kulîlkên buhaba Amûdê de bûn. Min jê hez dikir, ne hez-kirineke Irosî (îrotûk, cinsî), min ew dix-

west, min dixwest ku xuşka min bit, min jê re go.

Lê ez ne xuşka te me, di pirsan de ez keservedana kurdan im, ji min re got.


Kulîlk û jin hergîz (ebeden) xuşkên min ên spehî ne, diya min jî xuşka min e.. Dilovanî ji Göteborgê diherike, bi fi-rişteyên bêdeng ronî dibe, firişteyên ku ji bilî xwelibakirinê tu tiştî nizanîn, raperî-na periyêwan ên aştîxwaz dibihîzim, perî û ba, ji nişkê ve, wek teriyêwan masiyêni di avgîra ebedî de, masiyêni ku bi oksijînê re xwe li ba dikin, serîn xwe li camê dixînin û derbasî xemgîniya xwe dibin, li bin guhê hev dikevin:

— Çawan masî dikarin xemgîn bibin?

— Masiyêni te kor in birazê!

— Masiyêni te jî kor in Apo!

— Erê rast e lao! Lê ez dihêlim ku bibî-nin.. Ez wan dikim ximavê (hibir) ji bo xwendina koran. ☦





## Qamişlo

**S**evê te yên mişt çîrokên pîrhevokan, helkihelka sînoran, bîna barûdê û kurtepistên fetisî, tena-tena, bi sergiranî, li kolanên bajêr belav dibin, mal bi mal digerin, bi xwe re mistên mewîjan û zerikên şîr û mast, navê kuştî û girtiyan, kîsikên tûtina qaçax, pelikên qedexe û maçen qedexe, ji malekê dibine maleke dî, û bi dengekî nermejjî çîrokên perîyan, ên dêwan, ên jîn revandin û talankirinê dibêjin da komên zarokan bi germa laşan di himbêza malên te de di xew ve bibin.

Kolanên te yên bê ser û ber, her sibeh, bi reqereqa simê hespêن Polatiyan silava hev divedin.

Sûka te hê ji bîr nekiriye çawa zarokan "Şawî" dixapandin, çawa hemalan (barkêşan) bi dijwariya şerê çengalan pereyên rojê li hev par dikirin, çawa di qehwexaneyên te de xweşmîrên simbêl hinekirî bi yek fişekê di xwîna heyfê de dihatin gevizandin.

Di hûçikên te de govendên perîyan digerin, xêlê cinnan bi rê dikevin, sal û demsal tev dibûrin, babelîsokê har dilîzin û pêxemberekî agirperest û sêwilek di asoyên teqn û çirava te de li şopa siwarên qeralgeha çûn û nehatinê digere.

### Qamişlo!

Sevê te yên mişt tevzinokên rojhilateke avis, şahid in çawan qertemîrên te di berbanga berbangê de, tovê jiyanê bi lez û germebez disipartin germedeşten şenigejinan, û berê xwe didan hogiriya şevê, tivîngê û çiyan da ku keçikaniya te tûşî başûrekî bê bext û bê bay nebe.

Tu keleha xwîniyên serhişk ên bakurekî kovî bûyî!

Tu bûka wenatekî bê nav bûyî!

lêê! lê tu nabêjî ey Qamişloka min ci ocaxa deyûz tu hingavtî?

Tu nabêjî ka tu di ci xewnê de bûyî, li kîjan esmanî bûyî, û li ber siya textê kîjan Xwedayî bûyî, dema ku xurista bîncikyayî ji tîrsa sînoran, pelê payîzê bi ser te de weşandin, û tu spartî bêbaviya siwarên re-

vokî yên çolistanên tozperest.

Tu, êdî, ne keleha xwîniyan î lê axurê pîsemêran î!

Tu, êdî, ne bûka wenatekî bênav î lê heyirandiya wenatekî bê şerm û bi nav î!

îro qolinka tirsê ketiye hinavê te de, tu bûyî penaya dizan û bêkêran, kolanê te bi nivişt û berbejn, berzûrî rivdiyê sîxurên xwenkuj dibin.

Bayê revê ketiye qeremêne te de, wa pêşıya zaroyêne te di oqyanosêne sir û seqemê ve derket.

Xewnen sorgulî, di bihara zaroktiya xwe de, di xaçerêyêne sal û demsalêne te de ji rê dikevin, diçilmisin, zuha dibin û weke pelêne payîzê li ber pêlêne rewrewkê diçin, û bê xatir û bê oxir li kolanêne rûsar ên paytextêne dûr serê xwe dideynin û malavayiyê li jiyanê dikin.

Bakurê te yî serhişk û pozbilind, bakurê malbatêne xwîna zelal, îro di kolanêne paytextêne dûr de, bûye, başûrekî şermezar û parsek

Asoyêne te bûne dergehêne çûn û nehatinê, Cegerxwîn û Bavê felek çûn û nehatin, Behriyê delal, Şero, Hepsûno, Edra û Letoyê zirnevan çûn û nehatin.

Mecîdo û Melle bênav çûn û nehatin.

Ava Ceq-ceq, qiramêne di navbira Hilêlî û Nisêbînê de û aşê Mehmeqeya çûn û nehatin.

Ma qey tu nabêjî kezî kurê, eger hat û Newafo jî rojekê ji rojan li tevlî kom û koloz, şâşika sorbelek, şal û şapikê xerzanî û bedena ji nîşanan çû û nehat, dê kolanêne te êdî çavêne xwe bi dîtina ci qaremanî kil bikin.


Qamişlo!

Di şevreşa cîhaneke bê ol de li te digerim da ku xwe bibînim, gazî te dikim da ku zarokriyeke ji rengê tozê bînim bîra te.

Di şevreşa cîhaneke zikreş û rûreş de, ez li ser xewnen xwe digirîm, dûrî hilm û bîna kolanêne te, li çolistanêne befrînî li ser xaçerêyêne deryan û oqyanosan, matmayî mame.


Îro, ji dûrahiya bakurekî bê bakur, bi tîrêjên gelawêjê, xaçekî li ser sînga te dineqîşînim, û toza kolanêne te... Germa havîna te... Serhişkî û cirnexweşîya zarokêne te û... û sergiraniya keçikêne te, dikim nivişt ûbihnok û berbejin û bi xwe vedikim da ku li kolanêne rûsar ên Skand-navyayê bê nav û bê reng nemînim. ☐

\* Mecîdo û Melle bênav du kesêne romana Selîm Berekat in, a bi navê *Hozanêne taristanê*.



***Jînenîgariya min  
Cigerxwîn***

**Navníşana xwestinê: Weşanxaney Apec  
Box 3318, S-163 03 Spånga – Sweden**



**DUGIR** Kurdisk litteratur tidskrift

Box 3437, S-165 23 Hässelby -Sweden



**Seydayê Mele Ehmedê Namî**

**1906–1975**

Dilê me ji pola ye gurçik hesin  
Ji bo tol û doza welat em bes in  
Ji Namî me zanî ku em bibine yek  
Dijîn serbilind al û ol û serek